NIŞTIMAN

CİGERXWÎN

# RONAK

## DÎWANA 4'A

STOKHOLM 1980

NIŞTIMAN

CİGERXWÎN

Baran
Bavê Serkan

# RONAK

## DÎWANA 4'A

ÇAPA YEKEM

WEŞANÊN ROJA NU


STOKHOLM 1980

NIŞTIMAN

WEŞANÊN ROJA NU : I

Navnîşan : BOX 4038
14104 HUDDINGE/SWEDEN

ISBN 91-7672-000-4
Bokförlaget ROJA NU
Copyright Cigerxwin
Printed in Sweden by
Författares Bokmaskin
Stockholm 1980



CIGERXWÎN

# FEHRESTE

## BİRÊ WELATPERWERÎ

Hawar hawar ..................... 11
Kî hilgirî vî barê mın .......... 17
Hovîtiya dijmin ................. 20
Tiştên kesnedî .................. 25
Ez nizanim çi bêjim ............. 28
Çi ji mer divê .................. 36
Bi ser çiyan ketim .............. 39
Rewşa welêt ..................... 40
Setemkarîya dijmin .............. 41
Zor û çavsoriya dijmin .......... 45
Dûvê nav çiravê ................. 49
Kurdistan ....................... 54
Em şer naxwazin ................. 58
Ta neşewitin ronî nadî welêt .... 66
Welatperestî .................... 68
Hizam Zennar .................... 70
Aleqemşê ........................ 83
Ji nûve em berjor diçin ......... 89

## BİRÊ CİVAKÎ

Çibkim bi rojî û nimêj .......... 92
Fatê û mela ..................... 94
Ho ho şivano .................... 98
Derwêş xwe nadî pêş ............. 102

Şerê Dîna ........................ 105
Ji tirsa zana xwedê birne ezmana. 108
Ji xwedê divên û em firinga didin 112
Zengil dinalî .................... 119
Bi hêstira dilê dijmin nerm nabî. 121
Ho karker bibin yek ............. 123
İlham ............................ 126
Şefeq hilda ..................... 129

## BİRÊ EVÎNDARÎ

Ew dinya pir xweşe .............. 131
Diyarîya yarê .................... 135
Destê xwe paqijke ji xwînê ...... 137
Baxê şahbalê perî ............... 140
Çep û rast ....................... 142
Pîr bûm dil pîr nabî ............ 144
Bi tore bixwîn vê namê .......... 146
Me dil daye bertavê ............. 149
Di xewnên şevande ............... 152
Agir pêta evînê .................. 154
Di ser çavên me ra hatî ......... 160
Helbestak ........................ 164
Cejne yar dilxweş dibî .......... 171
Gazin çine ....................... 173
Nameya derd û xeman ............. 175
Yara ............................. 176

Penge rû ........................ 177
Tu zanî ma çi dermane ........... 179
Derdê derûnim ................... 181
Ocaxe yar ....................... 183
Yar hat civîna min bi şev ....... 185
Xeyamî .......................... 187
Tihnîme ......................... 189
Şêrîn lebê ...................... 191
Dilo mizgîn li te şabe .......... 192
Fetweya pîrê mexan da ........... 194
Dil perçe perçe hûr dikî ........ 196
Hove neda rengê xezala .......... 197
Bextê sipî ...................... 198
Guh bide dîrokê ................. 199
Eman heylê ...................... 201
Evîna dil ....................... 206

NIŞTIMAN

# PÊŞGOTIN

Ne hewce ye ku ez li ser şexsê Cigerxwîn dûr û dirêj binivîsim. Di çar parçên Kurdistanê da êdî kî heye ku wî nasnake û derheqa emrê wî da ne bihîstîye?Li welatên dereke jî Cîgerxwîn, wek şairekî Kurd ê mezin û wek hostayekî şoreşger bi nav û deng bûye.

Di dinyayê da hertişt gora şrûtên dorberê xwe pêk tê. Merivên rêber, serok û senatkarên mezin jî gora hewceyên zeman û mekan derdikevin, dighên. Miletê me şairek mina Cîgerxwîn derxist, ji ber ku Kurdistan hewcedarî wî bû. Ew nêzîkî dused sal in ku Kurdistan dikele, bo azadî ceng û şer dike û tê pelixandin.Gelê me hewcedarî dengekî bilind bû; Cîgerxwîn bû ew deng; wî di şiêrên xwe da gilî û gazînên, hêvî û daxwazên gelê me anî ser zmên û bilind kir. Bona vê yekê, gelê me jî ji wî ra xwedî derket, dengê wî bû dengê gel...

Cîgerxwîn hîn di xortanîya xwe da, di dema feqitîyê ku ew li Kurdistanê hêl û hêl digerîya, rewşa gel û welatê xwe bi her awayî, xweş fêmkir. Di wê demê da pirkes ji bindestîya welat ra dişewitîn lê yar û neyarên gel û rêya xilasbûnê bi awakî zelal ne didîtin. Piranîya wan, tenê zordestên bîyanî ji gel ra dijmin dihesibandin. Dijminên nav gel, mîna axa û şêxan, an ne didîtin, an jî xwe li ne dîtinê didan.. Eşkere ye ku, qasî dijminên der, yên hundir ji sedemê belengazî û nezanîya gel in. Cîgerxwîn ew yek dît û bi dil û can şerê wan zordest û kedxwaran kir. Cîgerxwîn bi xwe mele bû, lê wî gelek tiştên pûç û wala şikandin,avêtin avê, ew tiştên ku, ew e hezar sal in, di nav însanê me da têne gotin û wan famkor dikin, wek ji pûsê perdekî dikişînin ber çavên merivan. Cîgerxwîn rastî dît û rastî got. Di vê babetê da Cîgerxwîn bi rola xwe hişyar e, lê ne qure ye:

"Gotinê ku em dibêjin her kesî hişyar dikin,
"Ne gelek nû ne welakîn nû gihîştin van dora.."
(Ji Dewlemendê Bê Şeref)

Di alîyê nivîsandinê da Cîgerxwîn xwe paşda nade û têr dinivîse. Li ser bûyerên welat û dinyê, li ser babetên dîrokî û li ser dil û delalan.. Ew, di xortanîya xwe da çawa bi qîret bû, îro jî usa jîr e, jê hatîye. Ev dîwana wî ya çaran ku di 77 salên wî da derdikeve, ev yek jî nîşan dide ku Cîgerxwîn çawa karkerekî bê westan e di warê nivîskarîyê da. Cîgerxwîn,tevî helbestan, nivîsarên sîyasî û dîrokî jî dinivîse û di vî emrê xwe yî mezin da dimeşe, tevli civîn û meşînên sîyasî dibe, dipeyîve û agîrê şoreşgerî geş dike. Ew yek jî nîşan dide ku Cîgerxwîn îro jî wek xortekî bi hêvî ye, dilê wî ciwan e û ew di rîya rizgarîya Kurdistanê û azadîya gel da şer dike.

Eşkere ye ku xweşikî û delalîya şiêr, bi yekitîya raman û his û şikil pêk tê. Heke yek ji wan kêm be,an şunda bimîne, şiêr jî nagihîje kemalê û dilê merivan pê şad nabe. Şiêra Cîgerxwîn, wekî his û raman, bi alîyê şikil jî şiêrek xurt û zor e. Ew bi reng û çînîkên Kurdistanê xemilîne. Bi alîyê gotin, çîrok, metelok û mecaz dewlemend in û xweş-eheng in.Carê li "Konê Reş" binêrin: Seyda, qasî koçeran navê tişt û toreyên wan dizane û şiêra xwe bi wan xemilandîye, ew kiriye cewahîrek giranbiha.

Cîgerxwîn di dirêjahîya emrê xwe da bo gel û welatê xwe bê westan xebitî û hîn jî dixebite. Ew ewladekî Kurdistanê yê hêja ye. Lê Kurdistan jî qedrê wî dizane û bi heyîna wî şa dibe. Kurdistan, qedrê law û qîzên xwe yên camêr û canik ji bîr nake !

Şiêrên Cîgerxwîn îro li çar alî Kurdistanê di bajar û gundan da, di kom û mezran da di dest miellîman û melan, di dest mezin û xort û zarokan da ne.Raman û daxwazên wî bi vî awayî rû û can digrin, xurt dibin û di rîya azadîya gel da rolek mezin dilîzin.

KEMAL BURKAY
Îlon-1980

Beran

NIŞTIMAN

## PÊŞGOTINA MIN

Berî, ko ez dest bi pêşgotina xwe bikim, supasên xwe ji heval Kemal Burkay re pêşkêş dikim, ko pêşgotineke xwe ji dîwana minre danîye. Çawa, ko ez supasên xwe ji wan heval û mirovên ko ji bo çapkirina dîwana min re xwe êşandine û karkirine pêşkêşdikim. Weharen ge supasên xwe ji dewleta swêd re jî pêşkêş dikim, ko alîkarî ji bo çapkirina dîwana min bi minre kirine. Û ji hemî dilxwaz û alîkarên xwe re jî supasên xwe pêşkêş dikim.

Ez dixwazim divirde gotineke kurt û tevayî bibêjim ko hemî dîwan û ristên ristevan û nivîskarên kurd dereng û ne di çaxên xwede têne çapkirin. Ji lewra kêmweş û bêhêz û havil dimênin. Lê tenê tiştek heye ko rûmet û hêz û doz û daxwazên wan dîwan û nivîsaran diparêzî, ko ew jî eve, ko şoriş û kêferata gelê kurd her û her nayên rawestan. Û ji ber wilo jî, kengî bêne çapkirin, doz û daxwazên wan weke xwe dimênin û gewşek û bêhavil nabin.

Lê çima em nikarin zû bi zû nivişt û dîwanên xwe çapbikin û belavbikin ? Ev jî, ji ber ko çend dewletên şovînî û faşistî, welatê me dinav xwede perçekirine û heryek ji wan dixwazî me dinav xwe de bipişêvî û windabikî. Tevlî, ko ew jî dizanin, ko nema dikarin kurd û zimanê kurdî dinav xwede winda bikin lê hêjî, dinav wan xewnexav û rewrewk û sawîran de dijîn.

Stockholm 17/10/1980

CIGERXWÎN

## HAWAR HEWAR

Hawar hewar
Hawar hewar !
Van dijminan
Qada me xwar

Hawar dikim
Gernas û mêr
Kurdên di şer
De rengê şêr
Êrîş bikin
Tev wek piling
Ji nav xwe der-
Xin wan bi ceng

Hawar hewar
Hawar hewar !
Van çûçikan
Genmê me xwar

Talan birin
Wan dexl û pez
Çeper çirandin
Ketne rez

Hawar hewar
Hawar hewar !
Van dijminan
Qada me xwar !

Hawar dikim,
Ranabî kes
Şêx û mela
Û pîr û qes
Bi xaç û xişt
Û mizgevt û dêr
Em xistine
Tora neyêr.
Hawar hewar
Hawar hewar !
Van çûçikan
Dexlê me xwar.

Sed camî û
Dêr û kenişt
Naqos û bang
Û tîr û xişt
Sed lek ji
Tîpên *Lemterew*
Bikêr me nayên
Tev derew.

Hawar hewar
Hawar hewar !
    Van dijminan
        Qada me xwar !

Bi dest tiving
  Em herne şer
    Bişkî neyar
      Em bidne ser

Hawar hewar
Hawar hewar !
    Van qumbilan
        Genmê me xwar.

Şerme, kurê
  Mîtan û Lor
    Qada me bigrîn
      Ew bi zor
        Navdare ko
          Gernase kurd
            Îro çiman
              Mayîn zîgurd ?

Hawar hewar
Hawar hewar !
    Van dijminan
        Qada me xwar !

Hawar dikim
Gund û eşîr
Bajarî û
Mîr û gîzîr
Dijmin ne xur-
Te herne wa
Êrîş bikin
Sêncê ewa

Hawar hewar
Hawar hewar !
Van dijminan
Qada me xwar.

Dijmin bi zor
Û serbilind
Ji ber me girtin
Şar û gund
Ne nan heye
Ne war, ne cî
Namûs nema
Apê Hecî !

Hawar hewar
Hawar hewar
Van dijminan
Qada me xwar.

Em tevde rabin
Mil bi mil
Êrîş bikin
Dijmin ji dil
Destan bi pakî
Bidne hev
Welat bihêlin
Bo xwe tev.

Hawar hewar
Hawar hewar !
Van dijminan
Qada me xwar.

Em tev bira
Ol, ya xwedê
Cotê xwe
Bighê ser sedê
Em bidne pêy
Gernas û mêr
Tev herne dijmin
Rengê şêr.

Hawar hewar
Hawar hewar !
Van dijminan
Qada me xwar.

Em pêkve wek
Şêr û piling
Li ser çîyan
Em bidne deng
Xweş bidne ser
Pişte neyar
Bişkî û bimrî
Koledar !

Hawar hewar
Hawar hewar !
Van çûçîkan
Genmê me xwar.

Seyda cîger
Tev bûye xwîn
Dîsa li min
Derbûn birîn
Bişkî timî
Sermeyadar
Dilxweş bijîn
Em peyadar.

Hawar hewar
Hawar hewar !
Van dijminan
Qada me xwar.

# KÎ HİLGİRÎ VÎ BARÊ MİN

Qet nerm dikî dilê neyar
Ev gazî û hawarê min ?
Piştxûze, barê min giran
        Kî hilgirî vî barê min ?

Her roj û her êvar û şev
Hawar û nalîn tên ji dev
Guh nadine dengê me tev
        Heval û hem cînarê min

Kurdên nezan û rê nenas
Jar û reben, birçî û xwas
Petrol di bin de, bê kiras
        Nabênî xweş vî karê min

Bi dest neyar top û tiveng
Bi dar dixwazim herme ceng
Hawar dikim, qêrîn û deng
        Şikestiye ev darê min

Gazî dikim kurdên xewar
Rabin ji xew carek şiyar
Hawîr li dijmin bidne dar
        Tev gundî û bajarê min

Dijmin ku em derxin bi zor
Avên çeman em bibne jor
**Zaz û Hekar û Bext û Lor**
Pir xweş bikin vî warê min

Avabikin xan û sera
Em têde rûnin wek bıra
Da xurt bikin zêr û pera
Vî bingehê dîwarê min.

Rûnin li nav bax û çema
Naz û ciwanik bên sema
Hezar xwezî bi wan dema
Pir xweş dibin êvarê min.

Şahî bikin em roj û şev
Maçan ji lêvan bidne hev
Nû xweş dibî rewşa me tev
Ciwan dibin damarê min

Da bel bibin beybûn û gul
Carek nemênin kul di dil
Gul bidme yarê mil bi mil
Dil xweş bibî pê yarê min

Daxwaz çiye ji serxwebûn ?
Petrol û hatin û hebûn
Bi dest me bin hatin û çûn
        Pir xweş dibin bazarê min

Nû xweş dibin dax û birîn
Serbest û serbilind dijîn
Îdî ciger nabî bi xwîn
        Ta ko dijîm, yekcarê min.

# HOVÎTÎYA DİJMİN

Piştî şerê Erarat
Bi ser kurd de bela hat
Zar û zêç û mêr û jin
Ketin nav lepê dijmin
Dibên çil û heft hezar
Hemî reben, tev hejar
Ajotin Gelyê Zîlan
Hemî dane ber gulan
Lê serdaran çil keçik
Keç û bûkên pir xweşik
Pirê wan bûk û qîzin
Dako bi wan bilîzin
Lê xwe avêtin avê
Go: ev pîsî me navê
Stranek li ser çêbûye
Bi dilşewat lêbûye
*Xemo* ji bo me digot :
Dilê civatê disot.
Çav li serî sor dibûn
Na, ez şaşim, kor dibûn.
Ronik ji wan dibûn rêz
Wî xem dikirin hembêz.
Xemo, welatperwer bû
Dîwana min jiber bû.

Li ku rûnişta, digot:
Zû pertalê xwe difrot.
        Pertal welatperwerî
        Ne qumaş û ne hirî
Herkes dixwest bibênî
Bihna xwe pê derênî
        Xemo, bi xem, dilbirîn
        Ji dîwana Cigerxwîn
Gelek ristik jiber bûn
Bi axîn û keser bûn
        Ji kurdan re wî digot:
        Dil û hinav li wan sot.

Mirovekî karker bû
Şal û şapik diber bû
        Bi şar û kumê kolos
        Gelek diçû *Aleqos*
Vê paşiyê çû welat
Lê nizanim çi pê hat ?
        Min pir li wî dipirsî
        Ne carekê, sed û sî
Dibêjin hêjî saxe
Bi xanî û qûnaxe
        Heta par jî hê xweş bû
        Li welêt bû, rûgeş bû
Serpêhatî dirêje
Weke rojî, nimêje

Li Dêrsim û li Sasûn
Na, ez şaşim, hemî şûn
Li Iraq û li Îran
Ne kêmtir bûn ji tirkan
Eve rewşa bindestî
Çiman divên serbestî
Ez çi bêjim hê kême,
Bindest hemî wekê me.
Li her der têne kuştin
Bê xwedî ne, bê piştin
Şovînîtî, zordarî
Bicî tênin vî karî
Imperyalin têr pere
Wan daniye ji me re
Ev destûra çewt û xwar
Paşê bûne koledar
Heçî bindestê dijmin
Neçare têne kuştin
Divê destan bidin hev
Xebat bikin roj û şev
Dijmin ji ser xwe rakin
Lê ji bona çi nakin ?
Dijmin ji me zanetir
Welat li me perçe kir
Kurd nexwendî, perîşan
Dimrin ji bo gezek nan.

Dewlemendê mal genî
Dijmin bi wan dikenî.
Hin jî di hember pera
Xwe difroşin wek kera
Hin jî divên Kurdistan ;
Lê ji wan re gulistan
Em li jêr û ew li jor
Li me bikin zilm û zor
Olperest û êlperest
Navên kurd bibî serbest
Wan em perçe kirin xweş
Riwê kurdên teres reş
Arzan em dane dijmin
Ev bû sed û sîh û hin
Bawer dikin misilman
Hemî başin bi îman
Heçî mayî nebaşin
Çiqa jîr bin, li paşin
Roja qiyamet rabî ;
Mirov li Şam cema bî
Xwedê deynî mêzînê
Mihemed navan bixwînê.
Dojeh ji bo gawira
Bihişt ji bo me, bira !
Misilman tev bira ne
Ji hev re wek çira ne

Kîjan bibî padîşah
Deynin serê wî kulah
Gerdenxwar bin ji bo wî
Tev li kar bin ji bo wî
Milet çiye, ziman çî ?
Bere tazî û birçî
Ser deynin ber nigê wî
Em têr bikin zikê wî
Ji ber van mirovên dîn
Seyda bûye Cigerxwîn !

# TİŞTÊN KESNEDÎ

Dema ko kurdên Sasûn
Di hember tirk de rabûn
        Ew gernasê ser çiya
        Pirê wan bûn *eşqiya*
Serê dijmin êşandin
Qayîş pêre kişandin
        Gelek ji tirkan kuştin
        Kes li welêt nehiştin
Dijmin leşkerê giran
Bi xurtî şande ser wan
        Kurd naçare şikestin
        Heta îro bindestin.
Dijmin kete nav welêt
Kirin çi tiştên *kirêt*
        Jin û zarok dikuştin
        Xanîk ava nehiştin
Talan kirin bê jimar
Kurdên reben man hejar
        Dibin destê wan de man
        Hey hawar û hey eman !
Heft mirovên malmezin
Kuştin wek berx û bizin
        Qerwanake çar çembil
        Kuçik li bin sed û çil

Li ser êgir, tijî av
Ew dijminê bê zirav
Yek, yek xistin nav avê
Heta çermê xwe bavê
Her heft bi wê ava germ
Suhtin heta nema çerm
- Ey peyrewê Hilako !
Wilo dikin heta ko
Bi hesanî bibin tirk
Bi tov tavên, nebî firk
Heta kengî berberî
Ev kar qet naçî serî.

Wê hey roja mejî bê
Roja kur guh nedî dê
Lê em ne wek we hovin
Ji we bêtir mirovin
Dadgahekê dê çêkin
Navê milet dê lê kin
Ji tirk û kurdên birçî
Evên dibin *dewrimcî*
Çend mirovên pir zana
Wê bixwênin tim vana
Emê we bispêrin wan
Bela ew bikin ferman

Ewê ji we bipirsin :
Ka we çawa kurd kuştin ?
        Çavnêrê we ye sêdar
        Dimrin weke gurên har
Dema win bikin qêrîn
Xemgîn dibî Cigerxwîn.

# EZ NİZANİM Çİ BÊJİM

Heval, ez bilûrvanim
Dengê saza hozanim
Ji we ez dilgiranim
        Ez nizanim çi bêjim

Ez bilûra Marksim
Dengê rista bêkesim
Ji hêvîyan avisim
        Ez nizanim çi bêjim

Ez daxwaza Xanî me
Rewşa neqşê Manî me
Di ristê de kanî me
        Ez nizanim çi bêjim

Arê dilê Cizîrî
Tava tora Herîrî
Ez nûjenim bi pîrî
        Ez nizanim çi bêjim

Nakin dengê saza min
Guh nadin awaza min
Yan nizanin raza min
        Ez nizanim çi bêjim

Ez Mûsayê Hesarim
Ji we tevan dilsarim
Lê ez bi we nikarim
        Ez nizanim çi bêjim

Çiman hemî nabin yek
Leşker nakin lek bi lek
Kanîn ew bircên belek
        Ez nizanim çi bêjim

Hirç ketine nava rez
Gur ji hawîr têne pez
Ji xew rabin em bi lez
        Ez nizanim çi bêjim

Çine ev êl û eşîr ?
Ne beg maye nejî mîr
Ji dijmin re bûn gizîr
        Ez nizanim çi bêjim

Şêxên bi cibe û şaş
Xwe ji olê dane paş
Hemî bûne gornebaş
        Ez nizanim çi bêjim

Ey xortê ko ji nû tê !
Êko dinav zikê dê
Yan jî di pişta bavê
Ez nizanim çi bêjim

Ji bo we ez vê sazê
Xweş lê didim bi gazê
Bi daxwaz û nîyazê
Ez nizanim çi bêjim

Ev daxwaza me pir kûr
Mûsa, min ew bire Tûr
Îsa, min ew kire nûr
Ez nizanim çi bêjim

Ez miletim, ez mirov
Sedê bîsta neman hov
Direşênim bo we tov
Ez nizanim çi bêjim

Ji bo we min gelek hişt
Hin dîwan û hin nivişt
Gol ji avê bûye mişt
Ez nizanim çi bêjim

Sivik çû bihara min
Zer bûn pelê dara min
Dûr dûr diçî yara min
        Ez nizanim çi bêjim

Serî sipî, bûye pûş
Per şikestî *Qereqûş*
Ez dinalim li Merûş
        Ez nizanim çi bêjim

Perçe bûne lek bi lek
Hemî bazên qerbelek
Kengî karin bibin yek ?
        Ez nizanim çi bêjim

Dipeyivin pir qelew
Ji dijmin re çêlekew
Çawan serî dixin xew
        Ez nizanim çi bêjim

Heta dil ranewestî
Ez nabêjim bi sistî
Kêr gihaye ser hestî
        Ez nizanim çi bêjim

Xwendewarên kurên kurd
Em li qada xwe zigurd
Besin kul û xem û derd
Ez nizanim çi bêjim

Hemî destan bidin hev
Xebat bikin roj û şev
Ji dil dibêm, ne bes dev
Ez nizanim çi bêjim

Weke hevin ev û ew
Win guh medin tev derew
Milet şiyar bû ji xew
Ez nizanim ji bêjim

Milet tenê dikarî
Xweş hilgirî vî barî
Ristê bikî hevparî
Ez nizanim çi bêjim

Win dixwênin ji bo çî ?
Ma nabênin li her cî,
Cihan ber bi pêş diçî ?
Ez nizanim çi bêjim

Dijmin li her cî û şop
Xwedî tang û xwedî top
Li me dikin qope-qop
        Ez nizanim çi bêjim

Nabênin dijminên xwe
Her tişt birin ji bo xwe
Li min sor bû kiloxe
        Ez nizanim çi bêjim

Dibin destan hezar sal
Dane dijmin qad û mal
Berdin şopa bav û kal !
        Ez nizanim çi bêjim

Bav û kalên me nezan
Pez berdane bê şivan
Xanî bûbû bilûrvan !
        Ez nizanim çi bêjim

Ne ez xanim, ne Xanî
Ne Zerdeşt, ne Manî
Li xwe kir bargiranî
        Ez nizanim çi bêjim

Ne gernasim, ne egîd
Ez Şêxmûsim, bê mirîd
Lê dilewkim wek berîd
        Ez nizanim çi bêjim

Di ristê de çi merdim
Dil bi kul û bi derdim
Xwîna şehîdên kurdim
        Ez nizanim çi bêjim

Ronikên xuşk û diya
Ez axîna sêwîya
Ez gazinên jinbîya
        Ez nizanim çi bêjim

Ez hêvîyên girtiyan
Jana dilên birçîyan
Serma laşên bêcîyan
        Ez nizanim çi bêjim

Ez dixana napalim
Xwîna sînga delalim
Hawarim, nalenalim
        Ez nizanim çi bêjim

Ez dengê wan hejaran
Ketim şax û zinaran
Ez ew benê sêdaran
        Ez nizanim çi bêjim

Heq bi zore di jînê
Ez dilbijê evînê
Çi tê ji vê girînê ?
        Ez nizanim çi bêjim

Keko, ez Cigerxwînim
Dil bi kul û birînim
Van *ayetan* dixwînim
        Ez nizanim çi bêjim.

# ÇÎ JÎ MER DÎVÊ

Kurd perçe bûye wek Bedew
Lê şivanek ji mer divê
Ji bo ko zû rabin ji xew
        Bilûrvanek ji mer divê

Nayên jimartin, ker kerî
Bindest û jar û bê serî
Ji bo ko rabit berberî
        Çi, rêzanek ji mer divê ?

Ji bo ko em tev bibne yek
Destan bidin hev em bi çek
Zû bêne meydan, lek bi lek
        Qaremanek ji mer divê.

Roja bibî qîr û hewar
Êrîş bikin sênca neyar
Rengê birûskan bêne xwar
        Çi şervanek ji mer divê ?

Destûr divê, qanûn û rist
Ji nav me rabin: *kurt û pist*
Kesek nemênî xwar û sist
        Pozberanek ji mer divê.

Ji bo ko em bighêne hev
Xebat bikin em roj û şev
Kurd bin bi dil û can û dev
Merzibanek ji mer divê.

Ji bo ko em zû herne pêş
Bi tîp û tang û top û gêş
Qana xwe bigrin em li êş
Wehozanek ji mer divê.

Ji bo bibin xwedî welat
Zû deng bidin di Rojhilat
Bibin xwedî tîp û civat
Çi rêzanek ji mer divê ?

Divê xebat bikin bi rik
Ziman û dest û pişt û zik
Hawîr bilîzin em sivik
Pehlewanek ji mer divê.

Ji bo nemênin êl û ber
Divê bi hevre herne şer
Bişkê neyar, em bidne ser
Erdewanek ji mer divê.

Çi Lor û Gor û Zaz û Bext ?
Bê padîşah û tac û text
Bûke welat, xwîna me next
        Nijdevanek ji mer divê.

Ew kurdê gernas û nebez
Îro dikî bimrî bi lez
Bê av û nan û dar û pez
        Xwînrijanek ji mer divê.

Seyda, çine qîr û hewar ?
Çil sal dibê, nabin şiyar
Pişt xûz û binbarê neyar
        Ristevanek ji mer divê.

Bê mal û rûmet, dil birîn
Her dem bi ah û nal û şîn
Cerg û hinav tev kirne xwîn
        Hirmezanek ji mer divê.

## Bİ SER ÇİYAN KETİM

Heval megrî çiya herdem
Cihê xweşmêr û şêra ye
        Dîwarê serxwebûna kurd
        Ji laşê xurtemêra ye
Serefrazî bilinde, lê ;
Bi xwîn û kotek û zore
        Bijêrdeçûne bindestî
        Berê kurdan li berjore
Tenê serbestî eywane
Bilind û berze bala ye
        Tenê şûna serê min, te
        Di jorê wê de vala ye
Di kortan de eger razî
Tu dê xewnên xerab bînî
        Kirasê tirs û sawîran
        Li xo kî tim tu xemgînî
Ji doza xwe venabin em
Dixwazin ta wekû saxin
        Gelek şerme ku em saxin
        Û dijmin hê dinav baxin

## REWŞA WELÊT

Şoriş destpêkir qêrîn û gurmîn
Gulebarandin, li hawîr xurmîn
        Dijmin hilweşand tev gund û bajar
        Zar û zêçên me, jar û berdîwar
Li jor balafir, li jêr tang û top
Ji xwînê sor bûn hemî şûn û şop
        Welat bicarek dane ber şewat
        Millet perîşan, bê kar bê xebat
Birçî û tazî, hemî perîşan
Bê mal û bê cî, ne xew ne razan
        Êrîş tênin me ew gurên devlok
        Derketin çolan hemî pîrhevok
Ji ber firokan hawar û gazî
Jar û birçîne, pêxwaz û tazî
        Tev tirs û sawîr, dîn û sergever
        Gelî dagirtin axîn û keser
Diber lingan çûn jin û keç û bûk
Li ser lep diçin zarok û biçûk
        Ser û dest û pê, sor bûne ji xwîn
        Cigerxwîn bigrî, bigrî dilbirîn !

## SETEMKARÎYA DİJMİN

Kemal danîn çend qanûn
Kincê kurmancî rabûn
Heçî pêre bikî rik
Wê singiwan bixin zik.
Nema kum dan serê xwe
Li xwe nakin kesexe
Derpê, kiras, winda bûn
Ferman li tevan rabûn
Te yek ji van wergirta
Wê çawîş zû bigirta
Li te bida bi daran
Bixista nav dewaran
Pêncî kaxet cirmê wî
Diçirandin kumê wî
Şeref dihat ji wê de
Yek jî pêre di rê de
Dema ko dîtin çawîş
Dîn ko nexweş dibî îş
Kum avêt û çûne cem
Bi ser wan de lemelem
Ev çi kume li ser rê ye ?
Ka bibêjin ê kê ye ?
Şerefo, kum ê te ye.
Ceza li ser te heye.

Go: na, ne kumê mine
Kum ê hevalê mine
        Kum ji hevdî perçe kir
        Destê wî kelemçe kir
Bi qamçiya danî lê
Bêje: ka ev kumê kê ?
        Çend dar pêre kişandin
        Pênc kaxet jê sitandin
Li nav xelkê bû çîrok
Di govendê bû dîrok :
        *Ev kum ne kumê mine*
        *Kumê hevalê mine*
        *Şeref were kumê xwe...*

Kete rêza dîroka
Kete devê zaroka
        Li ber dikin dîlanê
        Kî daxwazê dizanê ?
Ew gundiyên hirç û hov
Bi zor me kirne mirov
        Ji ber ko dijmin xurtin
        Kincê me dan guhertin
Navê malbat û gundan
Bi kurmancî xeberdan
        Hemî kirin nadirist
        Heyran û lawik û rist

Tev danîne bi tirkî
Weke avê tu firkî
        Kesî dengê xwe nekir
        Niha bûne wek şekir
Heta gihan vî warî
Me pir xwarin dijwarî
        Gelek ketin ser çiya
        Tirk dibêjin: *Eşqiya*
Pirê wan hatin kuştin
Tiştek li şûn xwe hiştin :
        Navê kurd û Kurdistan
        Îro dikim dibistan
Çi dirist û nadirist,
Vaye ez wan dikim rist
        Çiqas ez bê mirêsim
        Ez wan sivik dirêsim
Tirkan dixwest me winda
Bikî, li şar û gunda
        Da bicarek bibin tirk
        Ne qapût û nejî kurk
-Winda nabin em bi dar
Ey peyrewê koledar !
        Em bindestin, serbilind
        Çi li şar û çi li gund.
Em nayêne pişavtin
Roj nayête veşartin

Xwedî tarîx, bi ziman
Bi nivişt û bi dîwan

Hawîr dikin kêferat
Geh kuştin û geh civat
Hin jî li ser çiya ne
Lê em ne eşqîya ne !
Xwedî doz û bi daxwaz
Nabin kolê borcewaz
Em dixwazin nûjenî
Îdî navên ezbenî
Em her weha bindest bin
Divên bijîn, serbest bin
Bibin bira, tev mirov
Ne xwînmij û nejî hov
Bi dilşadî tev bijîn
Kes nemênî Cigerxwîn !

# ZOR Û ÇAVSORÎYA DİJMİN

Piştî şerê Şêx Seîd
Paşde revîn tev mirîd
Xwe dan serê diyaran
Diçûn şerê neyaran
Dijmin tev bû ar û pêt
Bi zor kete nav welêt
Li xwe nerî serbilind
Agir berdan şar û gund
Serdarekî pir xwînxwar
Mêrkujekî dîn û har
Nivîsîye ev çîrok
Li ser adrêsa *Zarok*
Dinivîsî, dibêjî :
Ahan pêre dirêjî
Min agir berda xanî
Ji hovîtî, nezanî.
Min dî zarokek pepûk
Perîşan û pir biçûk.
Ji nav agir direvî
Divê ko zû derkevî
Lê çawa çav li min kir,
Xwe avête nav agir
Nû min zanî binbarim
Ez mêrkujim, xwînxwarim.

Ez bûme wek cinawir
Dijwartirim ji agir
Zarok ji min ditirsin
Qet li agir napirsin
Navê ko min bibênî
Xwe tavêjî nav xênî
Lê ez çibkim, çi bêjim ?
Tenê ziman dirêjim.
Ne mirîd û ne eşîr
Ne paşa me, nejî mîr
Li her cî kurd weha ye
Bê rûmet û biha ye
Têne kuştin hûr û gir
Çi tiving û çi agir
Em ne xercê şerkirin
Para me ye tim mirin
Mirin yeke, weke hev ;
Çi bi êrîş, çi bi rev.
Lê mirina bi rûmet
Ji bo ko bibin milet
Mêrê başe ser bi kuj
Li ser çiyan dibî mij
Ji kuştinê metirsin !
Li şewatê mepirsin !
Weke şêran herin pêş
Weke hevin şer û êş

Hey dê, rojekê bimrin
Ev çi tirs û çi *fikirin* ?
Ji bo bibin serbilind
Divê bigrin şar û gund
Wekî şêran herin şer
Dijmin bişkî, bidin ser
Welat bi zor bixin dest
Lê win mebin êlperest !
Çêkin ji bo xwe destûr
Ji bo sal û demên dûr
Zor bidin dezgevanî
Da nemênî xezanî.
Nû xwe bikin bi milet
Çêkin ji bo xwe dewlet.
Herin rêza miletan
Xwe bighênin dewletan
Leşker em saz bikin lek
Têr pere û hemî çek
Pê biparêzin sînor
Çi ê jêr û çi ê jor
Bibin bi dost û heval
Xwedî zêr û xwedî mal
Destûr bibî dîmuqrat
Dîmuqrata Rojhilat
Qad û xwendin tevayî
Wekhevî û birayî .

Serbest bibin mêr û jin
Ne sawîr û nejî cin
        Ne keşe û ne mela
        Li me çênekin gela
Ne mizgevt û nejî dêr
Çibkim ji vî xaçê zêr ?
        Tev bi hev re bikin kar
        Hemî bibin xwedî par
Ne zordestî, nejî dîn
Seyda nabî Cigerxwîn.

# DÛVÊ NAV ÇİRAVÊ

Kerek mirî li ber avê
Mizgîn kete wê navê
        Teba, li ser bûne kom
        Weke Firs û weke Rom
Şêr bakire gurê har
Rabe li me bike par
        Gurê reben, dîmuqrat
        Li hev xistin hemî qat
Goştê sor û çermelaq
Şêr di zik de faqe-faq
        Li wan tevan parvekir
        Şêr Bakirê: were vir !
Gur nêzîkî li wî kir
Lepek avêt serê gur
        Ji paşve çû nav avê
        Terî ket nav çiravê
Perçiqandin ser û dev
Dev û diran man ji hev
        Ji nûve gote rovî :
        Seydayê hov û kovî !
Rabe li me par bike
Lê bi rastî kar bike
        Ew rovîyê Mirdêsî
        Terî li pey bû rêsî

Ji nû ew perçe danhev
Geh bi lep û geh bi dev
        Heçî têde hebû xêr
        Danî li ber devê şêr
Para şêr tevde bû nerm
Man hestî û dûv û çerm
        Ew li tevan belav kir
        Tenê dilê şêr şa kir
Şêr bakirê: Ezbenî,
Ji ku hîn bû vî fenî ?
        Go: ji gurê nav avê
        Ji dûvê nav çiravê
Felsefa xanedana
Dane destê nezana
        Divê bikin xebatê
        Tevger û kêferatê
Ristê bikin wekhevî
Zorker ji ber birevî
        Em tev bibin weke hev
        Herkes bibî xwedî dev
Bixin destê xwe dewlet
Şêrê mezin bî milet
        Hemî bibin xwedî kar
        Bidin destê pala dar
Pîroz bibî zanebûn
Ji bo çiye serxwebûn ?

Şêrê mezin bî, serdar
Lê tev bibin xwedî par
Her yek li gor karên xwe
Ew bistênî parên xwe
Heçî şêr bî di xebat
Ew bistênin duqat
Axa û beg ne şêrin
Nema karin veşêrin
Milet hemî bûn şiyar
Ne wek par û ne pêrar
Şêrê bê kar û xebat
Naxin devê wî duqat
Heçî bikêr milet bê
Emê jêre bên: libê
Wî bidin pêşîya xwe
Weke bav û dîya xwe
Ji bo me bibî rêber
Çi di kar û çi di şer
Ne wek van kerdiza bî
Li ber dijmin weza bî
Di nav kar de weke şêr
Di şeran de erdeşêr
Hem bi roj û hem bi şev
Tev kar bikin weke hev
Kar ji bona teva bî
Bi biratî leva bî

Zor û setem, me navê
Nakevne nav çiravê
        Ne ew rovî, ne ew şêr
        Hemî bixun xêr û bêr.

Şêrên wesa naxwazin
Ne gilî û ne gazin
        Milet hemî bibî şêr
        Nebî, jor û nebî jêr
Bê tizbî û def û xişt
Welêt bikin wek bihişt
        Ne bindestî, nejî zor
        Bere bimrî qata jor
Tev de em bibin yek qat
Destûr bibî dîmuqrat
        Pale bibin xwedî kar
        Zevî bidin dest cotar
Sedê bîstem naxwazî
Em bibne borcewazî
        Doza me ye serxwebûn
        Lê dixwazin pêşveçûn
Ew dûvê nav çiravê
Di îro de, me navê
        Divên ko tev jin û mêr
        Di nav kar de bibin şêr

Şevan bikin ronahî
Bi dilxweşî, bi şahî
        Pir xwedî kin ga û pez
        Li her derî bikin rez
Tirên herî her derî
Bere bimrin serserî !
        Bilind bikin heçî baş
        Lê em kesî nedin paş
Milet tev bibin bira
Xwendin bibî wek çira
        Ko em dijmin bikin der
        Îdî em naxwazin şer
Em dixwazin pêşveçûn
Da kes nebî Cigerxûn

# KURDİSTAN

Bilinde bejn û bala te
Li ser taca te ezmane
Kitanek reng sipî daye
Serê zozan û Sîpane
Li jorê kanî û cobar
Wekû hêstir dibarin xweş
Li jêrê te dibênim ez
Bihişt û bax û bistane
Kirasek etlesîn keske
Bi rengê roje nexşîne
Li bejna te dibênim xweş
Bi surme şal û mîtane
Çi reng şêrîne yara min
Şepal û nazik û şoxe
Ferat û Dicle û Xabûr
Bi ser bejnê de berdane
Ji xwîna min tu lêv sorî
Ji bîna min gula corî
Tenê min bazinê zendên
Te zencîrin di linga ne
Evîna te kirim şeyda
Birîndar û perîşanim
Ji wan lêvên şirîn maçek
Ji derdê dil re dermane

Birîndarim bi topên
Awirên çavên belek îro
Were dilber ku destên te
Ji êşa min re Luqmane
Bi pîrî ez dixwazim ko
Bibim zava tu çidbêjî
Ne xewne ko dibêjim ez
Ne sawîr û ne gomane
Tu nabênî di govenda
Me da her kes diçî û tê
Li hawîr şahî û cejne
Sema û ger û dîla ne
Qelen xwîna mine çibkim ?
Divê ko ez bidim carek
Meger can û ciger deynim
Di vê rê de, çi erzane
Çi zanin rûmeta vê şeng,
Û şoxê begler û paşa ?
Bi qurbana tebin cana,
Hezar mîr û beg û xana
Ezim ku te ji destê
Dijminan derxim bi mêranî
Li ser sînga te serbest bim
Biparêzim te merda ne
Meger dûr û reşe rêçik
Li hawîr dijminên xwînrêj

Meke bawer bi tirsim ez
Ji sehpa û ji zindane
Serî min danîye vê rê
Divêm bighême armancê
Mebêje ko: gelek fersend
Ji destên xo we berdane
Dixwazim tirs û sawîr û
Fen û xapan ji xwe dûrxim
Bizane ev qerêja kurd,
Ne ya çend mah û sala ne
Heçî çûyî mede pey wî
Ji min gazin meke nazik
Metirse hê ji bona me
Demên xurt û mezin mane
Hezar salin mijî bûye
Qerêj hê nû ji xew rabûn
Dixwazin wî bişon carek
Me rêber pîre-rêzane
Çeka min zor û zanîne
Bi bîr û bawer û daxwaz
Bi tûjawir dinêrim ez
Li kevneşar û eywane
Siwêsra Rojhilatî xweş
Bi şîranî û nazdarî
Ji cobarên te ev hindam
Bicarek têne avdane

Mebêje: paşdemayin kurd

Kurên Kesra serî hildan

Li ser şax û çiyan lawan

Derefşa Kawe hilda ne

# EM ŞER NAXWAZİN LÊ EW TÊ BER DERÊ ME

Rojek ji xew şiyar bûn
Ez li hespê siwar bûm
        Çûme heta ber çiya
        Hesp siparte gundîya
Peya pêde berjor bûm
Heta serî pêde çûm
        Di ber min de qelem zêr
        Ziman tûje weke kêr
Lê nizanim çiye şer,
Hev dikujin ev beşer ?
        Bê şeşar û bê tiving
        Ne xencer û ne kuling
Rûniştîme ser latê
Pel dixişin, ku ba tê
        Min ber daye ezmana
        Ez ketime gomana
Ev çiyayên pir bilind
Kê rakirne wilo rind ?
        Çine ev newalên kûr ?
        Kîne ev hov û tilûr ?
Çidkin di nav vê jînê ?
Çi nasdikin bi dînê ?
        Di gomanan de çûm dûr
        Heta giham cihên kûr

Dengek hate guhê min
Dengê mêşê, vine-vin
        Min dî zermêşa hingiv
        Hawîr dikî give-giv
Çavê xwe min berda rê
Min dî kalek pêde tê
        Reşkalekî hêjayî
        Di rextan de pêçayî
Pêre cewdikê avê
Lê ne daye ber tavê
        Pî bi kalik, ser bi kum
        Go: *selamun eleykum*
Min go: *eleyke selam*
Were rûne ez xulam !
        Go: ez nikarim rûnim
        Niha ez bê *mikûnim*
Min go: kalê, wilo zû
Vê sipîdê diçî kû ?
        Go: şorişe, diçim şer
        Ne wek te taxim diber !
Xortek bûye birîndar
Min hiştiye li pesar
        Bi lûb-lûb û bi lav-lav
        Ji min divêt tasek av
Min aniye ev cewdik
Ezê bidmê lê hindik

Rabe were bibêne
Tevlî te em sisê ne.
Eger xwedênekî, mir ;
Tu tivinga wî hilgir
Bi dijmin re bikin şer
Geh êrîş û geh veger
Dilê min bû weke ar
Ez rabûm daketim xwar
Kete rê û mi da pey
Dikî qîr û heye-hey...
Metirse vame hatim
Weke birc û kelatim
Min dî xortek birîndar
Bi zikxişkê weke mar
Ji ber me ew direvî
Navê diber me kevî
Ji wî weye em dijmin
Em hatine bikujin
Çawa dengê kalê kir
Ling bi jêr de dirêj kir
Me zû xwe gihande cem
Xwîn li hawîr bûye çem
Gula sîngê gelek sor
Me ew rakir bire jor
Hawîr me kirin çeper
Paşê rûniştin li ber

Şal û şapên wî vekir
Birîn ji nû derman kir
        Hingî kire lave-lav
        Me zû dayê hinek av

Çawa ava xwe vexwar
Çav li serî çûne xwar
        Gelek nema, pir neçû ;
        Dîsa çavê wî vebû
Birîn çawa ye dektor ?
- Ne dektorim, lê pispor
        Hatî li çi digerî ?
        Divê berxa bikirî ?
- Na, pisporê mêra me
  Nêçîrvanê şêra me
        Divêm bêjim ji tere !
        Ev çi cenge, çi şere ?
Dîsa çavên xwe danhev
Îdî hew digerî dev
        Min go: hey wax ! wele mir
        Dilê min tev bû agir
Hinek ava germ û şor
Di çavan de bû kilor

Berjêr dibû zo bi zo
Min di dilê xwe de go:
Çiman hat û çiman çû ?
Lê kî zanî diçî kû ?
Dîsa çavê xwe vekir
Çend gotinên wek şekir :
Ey seydayê qelem zer !
Rast, nizanî çiye şer
Bawer nakim ez benî,
Belkî bi min dikenî !
Şer destkera maledar
Dawer jêre koledar
Tenê cotar û karker
Dibin êzing ji bo şer
Rûdinin ber masa xwe
Zêran dixin qasa xwe
Em tên kuştin weke şêr
Lê ew dibin xwedî zêr.
Ji berko em nezanin
Vê daxwazê nizanin
Em li jêr û ew li jor
Têne ser me xem û zor
Ziyan bo me, kar bo wan
Ew paşa û em şivan.
Şer tevde berdîberdan
Hemî şewat û talan

Tijî malewêranî
Birçîbûn û xezanî
        Lê dijminên me yên hov
        Bawer nakin wek mirov
Li taran û Anqera
Me nabênin wek bira.
        Ne li Bexda, ne li Şam ;
        Em nabêjin *cîm û lam*
Ger çi bi hev nexweşin
Tev ji mere zikreşin
        Divên ko me bihêrin
        Dinav xwe de veşêrin
Ê wan 99 hirik
Ê me, yeke qûn virik
        Wê jî dibin ji bo xwe
        Li me sor bû kiloxe
Kengî mafê xwe bivên
Ew dikujin tim şivên
        Dema dibêjin wana
        Me rêdikin zindana
Heta dibin bêmefer
Nû digel wan dikin şer
        Zanin ko şer ne başe
        Heçî şerxwaze, şaşe
Lê ev zor û ev setem
*Tazî* û turk û ecem

Li me bikin heta key ?
Li ser me bin Şah û key
Em jî wekî wan mirov
Ne xwînxwerin, nejî hov
Nema divên bindestî
Em dixwazin serbestî
Welat nadin me bê ser
Em jî dimrin der bi der
Meger tev bêne kuştin
Welat nadin dest dijmin

Em birane misilman
Lê dijminê me nezan
Şovînên kevneperest
Weke Nazî û faşist
Tev xwînxwer û hirç û hov
Têne şerê me bi tov
Balafir û tang û top
Hawîr dikin qope-qop
Carna paşde direvin
Carna pey wan dikevin
Belengazin tev zigurd
Eger bimrim, bijî kurd !
Dema soro wilo got
Dil û hinav li min sot
Agir berda dilê min
Kirin kêşî kulê min

Reş û tarî bû zevî
Îdî ziman hew livî
        Gorna wî me kir şikêr
        Paçek xiste serê dêr
Lê nivîsî bi destan
Canbêzarê Kurdistan
        Min rahijte tivingê
        Da ko em herne cengê
Kalo bala xwe da min
Go: ger dikî biya min ?
        Here rûne serayê
        Tu bi kêrî şer nayê
Kalo, kalê pir şepal
Bi şev ez anîme mal
        Dil bi xem û kul û şîn
        Ji dil bûme Cigerxwîn.

# TA NEŞEWİTİN RONÎ NADÎ WELÊT

Şeveke rûreş hewrên pir tarî
Li ser hev diçin banî û xwarî
Bahoz û dûman, tev mij û moran
Pêl bi pêl diçin xwîn jê dibarî
Li jor me dijmin, gulebarandin
Li jêr xwebxwetî, her dem neyarî
Ta kengî, dîlî, jarî, bindestî,
Ta kengî qelsî, mestî, bindarî ?
Kaniyên petrol me dane dijmin
Çekên qelsane: gazin û zarî
Şerme zariwên guhderz û dara !
Dijmin ji ber me bigrin vî warî
Zenda vemalin, bikevin Zagros
Êrîşî dijmin bikin bi harî
Em şêrên çiya, piling û ejder
Zaz û bext û lor, sor û hekarî
Rabin bibin yek, destan bidin hev
Ji bo me divêt tenê hişîyarî
Şazde milyon kurd gernas û mêrxas
Dane serê xwe ev reşe-çarî
Ta kengî dijîn perçe, perçe kurd ?
Ma kî dixwazî vî îş û karî !?
Raste bindestî karê qelsa ye
Ji ser xwe rakin wê em neçarî

Bere du milyon kurd bêne kuştin
Da welat derxin ji bin vî barî
Ên ko bixwazin neyên pişavtin
Divê bibênin reşî, dijwarî
Weke gernasan serên xwe hildin
Hemî bibin yek: gundî, bajarî
Navên eşîran ji ser xwe rakin
Xwe bighênin hev, perçe û parî
Bibin yek milet, yek ziman û dil
Dijmin naçî der bi mihredarî
Ger neyên sotin ez û tu û em
Ronî nadî ser welat tû carî
Xwîne me agir gurgeşdîkî
Gernasın jêre gaz û bettarî
Bi xwînê şîn tê dara serbestî
Dijmin naçî der bi ah û zarî
Divê bi xurtî em wî derênin
Nîv milyon leşker kurdên bijarî
Derkevin meydan tîp û tang û top
Dasînî, torî, bextî, berwarî
Êko bê kuştin cihê wî bihişt
Dîwana seyda jêre diyarî
Cigerxwîn bimrî neghê doza xwe
Gorî serê we pîrê Hesarî

## WELATPERESTÎ

Payebilindî
Welatperestî
    Çekên qelsane :
    Jarî û mestî
Zana û jîrim
Bindestê dijmin
    Çiqas dijware
    Evreng bindestî
Destan vemalin
Dakevin meydan
    Eger dixwazin
    Bigrin serbestî
Ey gernasên kurd
Rabin weke şêr
    Ji xwe bavêjin :
    Xwarî û sistî !
Weke erdeşêr
Bijîn serbilind
    Cenga azadî
    Nabî rawestî
Xebat ji bo me
Divêt bi xurtî
    Dilpak û zana
    Gelek bi ristî

Welat xweş bûke
Xwîna me qelen
Naxî ber sîngê
Bûkê nexwestî
Metirse ko kurd
Pir paşde maye
Kesî nedî goşt
Bê çerm û hestî
Qûnax bi qûnax
Diçî ser çiyê
Raste di vê rê
Gelek diwestî
Welat ta kengî
Wilo perçe bî ?
Em tev di nav de
Jar û şikestî
Cigerxwîn îro
Gel pir şiyare
Bese metirse
Kêr gîha hestî !

# HİZAM ZENNAR

Ev zennara Erebî
Ko li Cizîrê dibî
        Ne pişteke çarta ye
        Ne benekî bada ye
Zencîreke ji hasin
Ew tavêjin milê min
        Da min ji qurm verakin
        Qada min jî leva kin
Kurd nemênin li welêt
*Hizam* çiqas li me têt
        Ereb anîn gundê min
        Min dijmêrin ji dijmin
Pêk anîne sal bi sal :
Li Kerkûk û li Şengal
        Basên Bexdad, basên Şam
        Anîn meydan ev hizam
Da petrola min bixwin
Bere dijmin biruxwin
        Em sed hezar bê mikûs
        Li Cizîrê bê nifûs
Yek jî dengê xwe nakî
Heta newêrî bakî
        Ji birçîna tên Bêrût
        Hemî birçî û pêrût

Dixwazin bibne karker
Lê heq ji kar nayên der
        Nakin qêrîn û hawar :
        Dijmin qada me tev xwar !
Ev Erebên şovînî
Kurdan milet nabênî
        Dibêjin em hevparin
        Dijminê koledarin (!)
Lê ew bixwe koledar
Li me pêçan ev zinar
        Divên me bikin Ereb
        Bimrin bê sûc û sebeb
Gelo eve wekhevî (!)
Wey sed qeda pê kevî !
        Ne hevparîye , zore
        Tenê dinya bi dore
Roja me jî demek tê
Em guh nadin vê xetê
        Em ne gelek nezanin
        Em sînorên xwe zanin
Welatê me Kurdistan
Wer namênî kolistan
        Çav bi çav û dest bi dest
        Çendan me ev ne dixwest
Lê dijminê me pir hov
Me nabênin wek mirov

Pirtegala koledar
Wa da destê xwedî, dar
Lê dewletên hevparî
Çawa bikin vî karî
Ev karê koledare
Ne rêzana hevpare
Ne derketî, ne birin
Di welatê xwe pirin
Welat li ser navê me
Navê kal û bavê me
Ereb ji me natirsin
Ew jî wek tirk û firsin
Çav berdane petrolê
Tev hatina vê çolê
Ev gernasên ser çiyan
Eger rabin ser piyan ;
Zû dest bavêjin tiving
Bi gernasî bikin ceng
Roja em dest bidin hev
Bi dest wa nakevî rev
Tenê ew gunehkarin
Li ser me koledarin
Ji koledar pîstirin
Doza me windakirin
Neko di ser me re bin
Dixwazin em tune bin (!)

Em nabin tirk û ereb
Çira bimrin bê sebeb
Em Arîne, ne Faris
Ma genim dibî garis !?
Em paşketî rênezan
Em ketibûn dest dizan
Li ser me fermandar bûn
Lê tim kolê neyar bûn
Çiqas pîs û nezan bûn
Li ser me xanedan bûn
Em kiribûn gurên har
Tev ji hev re bûn neyar
Bi xenceran diçûn hev
Kuştin hebû, nebû rev
Talan û çîr û hawar
Dizan malê me tev xwar
Dijîn wek gornepaşa
Li ser me şêx û paşa
Karbidestê neyar bûn
Em jî ne pir şiyar bûn
Şêx û paşa, efendî
Pirê wan jî ne xwedî
Fermandar bûn, Qereqûş
Lê ji xwe re palên pûş.
Li ser me paşa û mîr
Li ber dijimin tev gizîr

Ew dikuştin bi sêdar
Wek mirovên dîn û har
Nedan serê xwe kulah
Yek jî nebû padîşah
Zarê dijimin dikirîn
Ta bi çolande firîn
Rojî û bang û nimêj
Şêxên şaşik bi qerêj
Wek bêgana digotin ;
Ta zimanê kurd sotin
Wan hatina me dixwar
Diçûn ber derê neyar
Nêçîrvan bûn şêx û mîr
Nêçîr didan dest wezîr
Goştê qelew bo dijmin
Para wan hestiyê min
Walî ew berdidan hev
Ma kî hebû xwedî dev ?

Diçûn ser hev bi êrîş
Hevsar bi destê çawîş
Ew paşa û derebeg
Li ber neyaran bê çek
Lê dem ji wan ev dixwest
Ev dikirin, ne ji qest
Ew qûnaxa ko têde
Pêşve neçûbû zêde

Êlperist û olperist
Hev girtibûn dest bi dest
Êlperistî destpêke
Paşdemane, ne rê ke
Ew qûnaxa koçerî
Tev kuştin û berberî
Hovîtî û nezanî
Malwêranî, xezanî
Hêjî nebûn bîrewer
Karê wan kuştin û şer
Hemî hov bûn weke hirç
Ser bi por û sîng bi pirç
Diz û xwînxwar û keleş
Ev jîn bi wan gelek xweş
Firs û Ereb, Tirk û Rom
Xwedî leşker, xwedî kom
Li nik wan çarsed hezar
Li cem begim sîh û çar
Zor dabûn mizgevt û dêr
Guh nedane taca zêr
Mizgevt dava neyar bû
Milet jî ne şiyar bû
Piropoganda dijmin
Şêxan dixist guhê min
Dixist serê min hevsar
Dixapandin wek keftar

Em ji qulan tanîn der
Ji dijmin re diçûn şer
Me miletên wek Bilgar
Bi zor dixist dest neyar
Niha va tê serê me
Mêranîya me kême
Lê ew Bilgar û Yewnan
Xwedî hebûn li pişt wan
Tev dewletên koledar
Ew ji wanre alîkar
Lê ew jî pir çeleng bûn
Bi dijmin re bi ceng bûn
Bê kuştin û bê zindan
Welat neket destê wan
Şerên Balqan navdarin
Kurd jî pê gunehkarin
Şerên wan olperestî
Kurd dibirin ji qestî
Koledarên bêxelat
Da ko bêne Rojhilat
Ev şer tanîne meydan
Geh Roman û geh Yewnan
Şêx û melan digot me :
Dijmin ev Rûs û Rome
Heçî di şer bê kuştin
Ew mêvanê bihiştin

Hezar perî pir ciwan
Li bihiştê didin wan
        Keç û kurên pir xweşik
        Dam û sedrenc û kişik
Çi bixwazî, tê ber te:
Agir, dijwar û sirte
        Heçî ji dil neçî şer
        Diçî nîvê dojeder
Tev agir û mişk û mar
Mirov dixwin, hey hewar !
        Ew kurmancê dil bi tirs
        Dema dibhîstin ev pirs
Weke şêran diçûn şer
Dişewitîn hişk û ter
        Îslam tev yek milet bû
        Yek welat û dewlet bû
Ne kurd hebû, ne Ereb
Ne rast hebû, nejî çep
        Remza sînorqelaşa ;
        *Padîşahim çok yaşa !*

Li mizgevtan melên kor
Bi ser me de bore-bor
        Bijî îslam, padîşah
        Biparêze ey xwedah
Ji ser me kêm nekî wî
Kesek nîne wekî wî

Li ser avê bê gemî
Diçî, bawer kin hemî
Heçî kesên misilman
Bi bawerî, bi îman
Tev jêre bibin leşker
Kengî bivê, herin şer
Hinleşkerê kesnedî
Çi derewek bê fedî
Wek qelaş û cenawir
Êrîş dikin ser gawir.
Ne raste şêx efendî
Em tev pala û gundî
Têne kuştin bêkefen
Ev çi derew, ev çi fen
Wek min ziman dirêjî
Kes nebû wer bibêjî
Belkî em tev nezan bûn
Em dilxwazê dizan bûn
Me bawer dikir ji dil
Ta şikestin li kurd mil
Dijmin kete nav welêt
Dîn miletek hov û şêt
Di vî welatî dijî
Bê awir û bê mijî
Êlperest û olperest
Mirin, ji bo xwe dixwest

Xesma dema petrol dîn
Bûn wek gurên dev bi xwîn
        Wan jî em berdane hev
        Heta nema kes bi dev
Dijmin *berik bịrin dam*
Li me pêçan ev hizam
        Ev Erebên pir nezan
        Çi zû wilo bûn rêzan !?
Rojhilat û rojava
Herdû dane ber çava
        Li ber çavan hevparin
        Lê va qada me xwarin
Jîr û zana û zîzin
Çawa bi me dilîzin !?
        Dibin dostê Barzanî
        Lê rêzanê me zanî
Hizam, zenar, li Cizîr
Ko pêktênin ewên jîr
        Basên Bexda, basên Şam
        Li ser pişta me çûn dam
Raste şerê hev dikin
Hîman di me wer dikin
        Gazî dikin kurdên jor :
        Tirk li we pir dikin zor
Kurdên nav me serbestîn
Ne kole û bindestin

Ew jî weke me dijîn
Win guh medin Cigerxwîn !
Emê alî we bikin
Bi tirkan re hevrikin
Win ji me pir nêzîkin
Em karin we xwedî kin
Bibin weke saziman
Emê çêkin Kurdistan !
Lê ev xapên eşkera
Nakevin serên kera
Şah jî dostê Barzanî
Lê Barzanî pê zanî ;
Şeş milyon kurd li Îran
Winda dibin bê ziman
Şah serbestî nadî wan
Nadî me çekên giran
Ko em dijmin bişkênin
Welat tevî bistênin
Kurdên xwe nakî milet
Çawa me bikî dewlet !
Dijmin hemî wilo ne
Elo ne, yan Silo ne
Hemî divên xwîna me
Kesek navê jîna me
Divên ko me veşêrin
Di nav xwe de bihêrin

Navên me tev guhertin ;
Da bibêjin, ne kurdin
Lê bizane, ey neyar !
Zivistan çû, tê bihar
Ew giyayê bin kevir
Şîn tê rojek diçî der
Bijîn kurd û Kurdistan !
Nema dibî kolistan !
Lata we ew kîrî pûşt
Baran lê hat hemî şûşt
Kurd şiyar dibî bi lez
Gavan tavêjî bibez
Hawîr civat û xebat
Dibin şêrên Rojhilat
Hindik maye bibin mêr
Êrîş bikin weke şêr
Wê çaxê dê çi bêjin ;
Ko em xwînê birêjin
Kî jê ber pirsiyare ?
*Hisab* gelek dijware.
Miletê we razaye
Yan jî di xew de maye
Roja bibî weke me
Ewê êrîş bibin we
Hisab bi wer bibênin
Tola me wê hilênin

Çavnêrên wene sêdar
Ey xwînxwerên gunehkar !
Werin alî me bikin
Em û we ne hevrikin
Şiyar bibin mebin dîn
Guh bidêrin Cigerxwîn !

## ALEQEMŞÊ

Gundek heye serxetê
Navê wî bîra me tê,
Dibêjinê, *Alqemşê*
Al qumaşê, xweş rewşê
Nuqta tirka têde bû
Başçawîşek lê hebû
Biner li vê sosretê ;
Haco hat binya xetê.
Qumandarek hate gund
Qereqûşek serbilind
Go: bi emrê dewletê
Heçî daket bin xetê
Bere tev bên textê min
Ji wan re bî bextê min.
Ezê wan azad bikim
Serbest û dilşad bikim
Tevlî dan û sindê xwe
Wê vegerin gundê xwe
Gelek kal û xort û rind
Vegerîyan, çûne gund
Li gundê Aleqemşê
Ew kom kirin li *hewşê*
Mêr bi carek girêdan
Bi kindir û bi lêdan

Xort û pîr û kal û jar
Weke êzing, weke dar
        Girêdan û dane hev
        Di dest wan de nema rev
Hawîr danîn hûravêj
Ew tivingên dev dirêj
        Serdarê wan *emir* da
        Tevan bi hevre berda
Hemî ketin li ser ax
Bi ser hev de bûn kelax.
        Gaz berdane ser laşa
        Ji nû dan ber manaşa
Heta ko tev bûn arî
Ma kî dikî vî karî ?
        Jin û bî û pîr û bûk
        Keç û xame tev biçûk
Bi hev re xistin xênî
Da ko kes wan nebênî
        Rêsî û xernûf û pûş
        Xistin xênî, Qereqûş
Agir berdan wî xanî
Dixan bilind bû banî
        Heta ko tev Şewitîn
        Laşê wan tev peritîn
Heçî pêjin jê dihat
Bi singiwan kirin mat

Pîrek ji wan xelas bû
Tim dil bi *tasewas* bû
Li gundekî Alîyan
Em li pîrê civîyan
Wê çîrok ji mere got
Dil û hinav li min sot
Wê çaxê pîra torê
Min nivîsî li gorê
Lê min bi kurtî digot:
Hingî dilê min di sot
Hezar û çarsed û sî
Weke min jê dipirsî
Çar, yan sê jî berde ser
Wilo zanim vê ji ber
Yanî dikin yek hezar
Hem çarsed û sîh û çar
Hûr û gir û jin û mêr
Bi hevre dane ber kêr
Paşê dane ber şewat
Bûn xelata Rojhilat
Fermandarê-Qereqûş
Sotin bi agirê pûş
Ne rojname, ne kovar
Kesî nego: hey hewar !
Qereqûş bûn dîmuqrat
Niha dostên Rojhilat

Kiye dostê hejaran ?
Perîşan û binbaran ?
Herkes dostê xurtemêr
Em tev didin pesnê şêr
Kî hevalê mişka ye ?
Yan kî dostê rişka ye ?
Bê xwedan û bê piştin
Bi neynûka tên kuştin
Ê ket bin lingê devê
Mirin tenê jêr divê
Sinbil çi reş û çi sor
Ko ne xurt bî naçî jor
Berepaş ew direvî
Ya nikarî derkevî
Zû zer dibî, dibî pûş
Di bin lingê qereqûş
Kurd ko divên serbestî
Yan ko nevên bindestî
Divê xwe bidne kuştin
Da ko dijmin *biqeştin*
Heta xwînê nerêjin
Em nikarin bibêjin :
Ku em jî bûne milet
Xwedî leşker, bi dewlet
Bi dev em gelek mêrin
Lê di dil de newêrin.

Em ji hev re weke şêr
Ji dijmin re çelsemêr.
Ez ne dînim, ne gêjim
Divê ez rast bibêjim :
Mirov du qat li herder
Yek li bin û yek li ser
Qata kurdên xwedî mal
Bi dijmin re bûn heval
Nema divên serxwebûn ;
Tenê divên bixun rûn
Ku raserî milet bin
Bere dijmin dewlet bin
Ew jî diçin parleman
Tev birane misilman (!)
Qata jêrî tirk û kurd
Tev birçî ne, tev zigurd
Divê ew dest bidin hev
Xebat bikin roj û şev
Bixin destê xwe ew dar
Herdû bibin xwedî par
Yanî bibin du dewlet
Dostê hev bin du milet
Yek bin li hember neyar
Rojên pir teng û dijwar
Qerequşan bikujin
Hingî herdû dipijin

Bibin dostê Rojhilat
Hew çêdibin ev şewat
        Aleqemş bibî pîroz
        Lê çêbikin gewreqos
Gorna kuştiyên winda
Ronî bidî wek finda
        Koçê barkin kul û şîn
        Kes namênî Cigerxwîn.

## Jİ NÛVE EM BERJOR DİÇİN

Welat hemî ji dest me çû
Axa carek ne xeyidî
Lê îro gundên wî diçin
Binêr çawa dixeyidî ?

Xwedî ku pez berdî çiyê
Ser deynî tamara xewê
Her kes dizanî ko gur û
Wawîk û diz dibin xwedî

Şêx û beg û axane ko
Em dane bin destê neyar
Li ser me xo bilind dikin
Bê şerm û bê tirs û fedî

Milet şiyar bûye ji xew
Zanî çine rast û derew
Nema dibî kolê we ew
Ma kengî şêr dibin gidî ?

Nezanî ketbû nav welêt
Me destê şêx maçî dikir
Qesra bi me ava dikî
Lê nan û nîskê, pir didî

Xelk bûne padîşah bi zor
Hasin bi zanîn birne jor
Lê ê me berjêr bazdidin
Ta bûne keyxwayê Şidî

Ava Ferat ji jorve tê
Kî karî xwel ber ragirî
Lê ko seqem bi serde tê
Dibî qeşem dicemidî

Hîmek ji banîve ku tê
Kî karî rawestî li ber ?
Lê ko ji hev belav dibî
Her yek bi cîkî rû didî

Ev hîme, şahinşahî ye
Lê perçebûn, axatî ye
Şopa we xwar û çewt û vir
Riya rast û dirist, me dî

Pê şopa karkeran herin
Lê bi loks û çira herin
Ber bi birc û sera herin
Sed bi yekî, yek bi sedî

Divê milet şiyar bikin
Cotar û palan kar bikin
Xencer bi dest rabin ji pê
Daxwazê bigrî, bernedî.

# ÇİBKİM Bİ ROJÎ Û NİMÊJ

Tazîme, birçî me, mela !
Çibkim bi rojî û nimêj ?
Kom bûn li min derd û bela
Çibkim ji vê rîşa dirêj ?

Te ez kirim kolê neyar
Te ez ji banî birme xwar
Bindestê dijmin mest û jar
Derman çiye ka wer, bibêj ?

Kurtan li mil ez bûme ker
Barê neyaran tim li ser
Pişta mine, ah û keser
Bîr û mijî tev bûn qerêj

Banga te ya sar û rijî
Qet agirê dil nakujî
Ev kar bi bangê napijî
Ey rî dirêjê dîn û gêj !

Min ev nivîştên pel gemar
Xweş xwendine her yek ducar
Zanim di wan de nîne kar
Ez vê dibêjim hê ji mêj

Bibin xwedî top û tiving
Herdem li kar bin wek piling
Roja bibî hawar û ceng
        Mêrane xweş, xwînê bi rêj !

Hevbang û hevsazê te me
Hevxwendin û razê te me
Ez dost û dixwazê te me
        Tenûr me dada, nan bipêj !

Bê cîme ez, bê kinc û nan
Awir weza û bê diran
Li ber pezê we bûm şivan
        Hêjî nezanî, hêjî, hêjî

Min dotiye, min xweş meyand
Min xweş nixwamt û xweş kiland
Min ew kire rûn û heland
        Dijmin ji bo min hişt dewêj

Qesr û sera û qad û rez
Mal û sewal û dexl û pez
Herçî bi don û goşt û bez
        Bo xo birin bo min kelêj

# FATÊ Û MELA

Ev çi rîşe, ev çi şaşe ?
Ya mi berde, yabteraşe
Ev çiye berdaye paşe ?
        Jêre navên *cîm û lam*

Ez bi vê rîşê û şaşê
Bê izin dighême paşê
Pê dixum *mûç* û me-aşê
        Serbilindim pir *kiram*

Ez biçûkim nûciwanim
Pir bi van îşan nizanim
Lê ji wan ez dil giranim
        Ez divêm *xemr û medam*

Ez mela me, ev heramin
Bes bibêje vê li ba min !
Şerbeta lêvan te da min
        Nazika şêrîn *kelam !*

Nazikim sermest û gêjim
Ez ji dev şekir dirêjim
Tim dixwazim rast bibêjim
        Min divêtim *nay û cam*

Rî sipî me, ez mela me
Ez xwedan *sewm* û *sela* me
Ev di ola min *hera-me*
        Bes bibêje ez xulam

Rî sipî bû, pîr û kalî
Rû ji rindî maye *xalî*
Roj û şev herdem dinalî
        Ez delal û meş-xeram

Meş-xeramê, ez xulamê
Dil ji min girtî bi damê
Guh mede vê nay û camê
        Totîya eywan *meqam* !

Totîya eywan bilindim
Pir şepalim, ez lewendim
Nazedar û gewr û rindim
        Min divêt mêrek *temam*

Ez çilome, qeynebaşim !?
Cibepoşim ser bi şaşim
Ta ku aşî ez qeraşim
        Nav û dengim çûne Şam

Dê çikim ez nav û denga
Dil dixwazî rewş û renga
Awirên şêr û pilinga
        Dê çikim kalek *heram*

Ger çi kalim, dil ciwanim
Ez di vê rê pehlewanim
Dilbijînê xweş dizanim
        Dil bi şewq û pir *hiyam*

Pîr û kalî, kevnewarî
Tevde bûrî, bûyî arî
Qet bi vî karî nikarî
        Kalemêrek bêqiram

Wer mebêje, ez şiyarim
Wek bizotim, pêt û arim
Ez di vî warî li karim
        Ey şepala rû ji xam !

Ez ciwanim terh û katim
Pir şirînim wek nebatim
Ne ji bo malê te hatim
        Min divêtim *zewq û tam*

Ez mela me, dewlemendim
Şêxekî pir mal û gundim
Ez li her der serbilindim
        Ey delala bisk ji dam !

Sed tifû ev mal û zêre
Dê vekim sîngê ji kê re ?
Min divê yek xortemêre
        Ez di jînê nû giham

Pir şirînî, nûgihayî
Wer, li nik min pir bihayî
Lê tu îro ejdehayî
        Ez di nêv benda te mam

Dev genî bû, bê diranî
Rast dibêjim, lê nezanî
Perdeya şermê hilanî
        Min tu navê *wesselam*.

# HO HO ŞİVANO

Ho, ho, şivano, hoho şivano,
Dil bi kulo, bi kovano !
    Tu pez berde pişta sûrê
    Dest bavêje ser bilûrê
Belkî milet ji xew rabî
Dikim, nakim, şiyar nabî
    Li paş maye har û germe
    Ne wek pezê te rû nerme
Biroj pêde divê razê
Qet guh nadî ber vê sazê
    Mirov gihane ser heyvê
    Bawer nakin ji min peyvê
Wekî loke diçî di rê
Hevsar bi kurtanê kerê
    Kore, li pey koran diçî
    Rêber mela, şêx û hecî.

Hoho şivano, hoho şivano,
Dil bi kulo, bi kovano
    Pezê xwe zû berde çolê
    Kaşo bigre were holê
Gokê bidin em ber şega
Derxin ji nav xo van bega
    Ew rêber û dostên neyar
    Çend sale van malê me xwar.

Bûn rêberê milet hemî
Nanîn delavê, wan gemî
        Ziman û qad hiştin beyar
        Pêşkêş kirin destê neyar
Bi ol û êl xistin di xew
Heta ku em bûn çêlekew
        Heta ku rêber bî Elo
        Wê xwarina kurd bî çilo

Hoho şivan, hoho şivan ;
Em bendeyê dengê te man
        Dengê bilûrê pir xweşe
        Pê xweş dibin can û leşe
Givgiv bike her dem li gund
Bêne sema tev gewr û rind
        Lêv sor û dêm gul bên sema
        Derxin ji dil derd û xema
Perda reş û xemrî û fot
Rakin ji ser xwe bên bi lot
        Lêxe tu saza ceng û şer
        Da xort ji hawîr bêne der
Bigrin bi hûravêj û top
Erîş bikin ew Qope-Qop
        Bişkî ji ber wan tim neyar
        Milet ji xew rabit şiyar.

Hoho şivan, hoho şivan,
Ey dil bi êş û derd û jan !
        Wek te şivanim ey heval !
        Bilûr şikestî, nîne mal
Îro qelem awaz û saz
Ez bûme wek nîvborcewaz
        Têm û diçim ez roj û şev
        Qatan di hejmêrim bi dev
Ne pez heye, nejî bilûr
Bi dev dikim ez lûre-lûr
        Lê kes di van roj û şevan
        Guh nadî ber dengê şivan
Zanim siyaset tev derew
Divê ku kurd rabin ji xew
        Destan bidin top û tiving
        Li ser çiyan qêrîn û deng
Ji nav welêt derxin neyar
Qada me namênit beyar

Hoho şivan, hoho şivan ,
Kurd bendeyê dengê te man
        Lêxe li ber latê bilûr
        Hişyar bike hov û tilûr
Bib û werîn tilyên qelew
Da kurd şiyar bin tev ji xew
        Guh bidne vê sazê ji dil
        Xweş nasbikin razê ji dil
Ka çi dibêjî ev bilûr ?
Daxwaz çiqasî kûr û dûr ?
        Dilsoje saz, tev derd û xem
        Şanî didî zor û setem
Tev kuştin û talan û şîn
Çendan di nav de tê evîn ?
        Saza teye cergê me sot
        Xortan diçelqênî bi lot
Xumxum dikî rengê çema
Bisk û kezî pê tên sema
        Dengê bilûrê pir bi tîn
        Cerg û hinav min kirne xwîn
Hoho şivan, hoho şivan ,
Kurd bendeyê saza te man.

## DERWÊŞ XWE NADÎ PÊŞ

Gurmîne derwêş har û dîn
Hawar dikî qêrîn û şîn
Savar û nîvişk jêre bîn !
        Birçîne zarok tev li mal.

Keşf û keramet qet nema
Çenda bikî reqs û sema
Dilnermîya xelkê nema
        Erbane bûye wek qepal

Bes qîr bike derwêş reben !
Wek rovîyê pir xap û fen
Herkes dizanî dav û ben
        Nemane ew reng *sir û hal*

Ka *hey, hey* û ew *hal û sir* ?
Şêx û mela tev bûne gur
Dijmin zora ola me bir
        Ferman li wan rakir Kemal

Binêre şêx û sofîya !
Bi çiv diçin wek rovîya
Xwe dane tengala çiya
        Tev dîn û mezheb bûn *betal*

Derwêş, tu bes hir-hir bike !
Rabe tu rîşê kur bike
Xwe dûrî hal û sir bike
        Fêde çine ev *qîl û qal* ?

Ka Neqşebendî, Qadirî ?
Tekye kirin xana kerî
Xwe navêjin nav agirî
        Ew şah û ew şêr û şepal

Ka ew sir û ew *zikir* û xişt ?
Bazbend li kû ma, ka nivişt ?
Dijmin bi dest şêxê te kuşt
        Bê fêde çûn ew mah û sal.

Ev dize, yan derwêşe ew
Rengê mirîşk û mêşe ew
Derd û bela û êşe ew
        Serpoşê cejna kerneval.

Pîsî bi navê şêx dikî
Şêx jî bi ser de rêx dikî
Wek rêx û şêx û mêx dikî
        Bê cibe û şerwal û şal

Erbane bavê wer bixwîn !
Jehre we xiste ol û dîn
Heta Ciger min bûye xwîn
        Welat bixwazin, em heval !

## ŞERÊ DÎNA

Rojek ji ên biharê
Rûniştibûm bin darê
        Min dî du kes tên di rê
        Dûr ketibûn ji pirê
Girtin dar û çûne hev
Ne navcî   nejî rev
        Kumik li hev kirin sor
        Li wê navê bore-bor
Ez zû rabûm ji bin darê
Min xwe berda devê rê
        Ez ketim navbera wan
        Çawa dîtim rawestan
Min dî ko herdû jî dîn
Dest û serî, hemî xwîn
        Min go: hey malik wêran !
        Win ji hevre wek şêran
Xelkê malê we tev xwar
Win jî li hev didin dar.
        Go: rast dibê, ezbenî !
        Şeytan bi me dikenî
Em herdû jî hov û dîn
Were tu me li hev bîn !
        Ji min re go: ê dev lal
        Ji gund virde bûn heval

Em gihane derê han
Pêre hebû hinek nan
Min kir, nekir, neda min
Go: bes eve keda min
Welle bimrî nadim te
De xwe bigre hatim te
Çûne hevdî wek beran
Ev şer ji bo gezek nan
Ê zik mezin û bawî
Rabû darê xwe da wî
Go: bişkîne serê min
Ha, ji tere perê min
Go: na, ez tu birane
Ne birayê pera ne
Em bi hev re bûn heval
Çine pere, çiye mal ?

Gazin wan kirin bi dev
Paşê çûne riwên hev
Bû tiq-tiqa kenê min
Li zik sist bû benê min
Min go: lawo aferîn !
Kî dibêjî ku win dîn ?
Xwezî beg û axên kurd
Wek we bimana zigurd
Belkî li hev bihata
Biketa nav civata

Ev paşa û beg û mîr
Tev bibûna wek we jîr
Xwezî şêxên xwedî dîn
Hemî wek we bibin dîn
Belkî em wan bikin yek
Xwe rapêçin ew bi çek
Bikevin ser diyaran
Bikin şerê neyaran
Bextê kurde, malmezin
Ji milet re tev dizin
Ji dijmin re tev rencber
Şêx û begên xwelî ser
Wek we nikarin ew tev
Herin lep û riwên hev
Bibin yek partî û bend
Li nav xelkê serbilind
Qêrîn bidin zinaran
Êrîş bikin neyaran
Dijmin derxin ji welêt
Lê mexabin ne wek şêt
Çiqasî em dibakin
Lê ew dengê me nakin
Çil sale ez bi qêrîn
Ji ber wa bûm Cigerxwîn.

# JI TIRSA ZANA XWEDÊ BIRNE EZMANA

Demek ez derketî bûm
Belkî ji derb ketî bûm
Direviyam gund bi gund
Xwe vedişart weke kund
Melak hebû li bajêr
Bi qerêj û xwedî xêr
Bi xanî û xwedî mal
Bi dikan û bi pertal
Yanî ne birçî, ne têr
Mala wî bû şevbiwêr
Gelek caran diçûm cem
Direvandin kul û xem
Dipeyivîn ji kevnar
Hem ji aş û ji bajar
Dostê minê nimêjker
Tizbî, sîwak tim li ber
Nimêjker û rojîgir
Doza kurdîtî dikir
Eger derew, eger rast
Xwe ji çavan diparast
Bawer dikir mal bi dîn
Tê komkirin, tê civîn
Min ji wî re tim digot :
Bese te mala xwe sot !

Çi nimêj û rojî ne ?
Çi sîwak û tizbî ne ?
        Hemî çîrok û derew
        Mej dijmin re dixin xew
Lê ew bi min dikenî
Tenê digot: ezbenî !
        Tu pir qencî, Cigerxwîn :
        Tenê êrîş meke dîn !
Rojî, nimêj pir başin
Bê ziyanin, belaşin
        Raste, derew, em dikin
        Dilê xwe pê xweş dikin
Çend sal di wê navê çûn
Zû winda kir ew hebûn
        Weke min ma bê qerêj
        Berda wî rojî, nimêj.
Di ser mere borîn sal
Ji zindanê hatim mal
        Rokê hate mala min
        Pala xwe da pala min
Dem rojî bû Remezan
Bi rojî bûn tev nezan
        Dinav wan de em gawir
        Weke dir û cewahir
Dema xwarin hat ber min
Go: ka kevçî bidin min !

Weke gurê birçî, har
Me herdiwan xwarin xwar
Min go: Seyda, go: de bêj
Ka ew rojî û nimêj ?
Li min nerî û kenî
Go: nezan bûm, ezbenî !
Pêket felsefa xwe got
Dil û ciger li min sot
Me ajote sersedê
Heta gihan bal xwedê
Go: mirovên pir zana
Xwedê birne ezmana
Lê teng nekirne qefes
Da neghênê destên kes
Eger li vir bihişta ;
Meyê ew zû bikuşta
Berê xwedê xurm û dar
Me dişkand û me dixwar
Lê jîrekan ew bir jor
Di dest wî de maye zor
Vê gotina pir mezin
Agir berda dilê min
Min go: seyda aferîn !
Niha bûye dûrebîn
Go: piştî bûme xezan
Bûme pêzan û rêzan.

Min go: Seyda *aferîm,*
Tu rast bûye weke rim.
Rûmet nebî, çiye dîn ?
Tu jî bûye Cigerxwîn.

# Jİ XWEDÊ DİVÊN Û EM FİRİNGA DİDİN

Ez dihatim rê û rê
Heta giham ber pirê
Min dîn çend kor û hejar
Dest bilindin, qare-qar
Mal dixwazim ji ezman
Em firingan didin wan
Hin gêr bûne ser qadê
Dikin qêrîn: ya xwedê !
Xwedê ji wan ne razî
Çima lê dikin gazî ?
Eger xwedê bixwazî ;
Ne hewceye ev gazî.
Ji xwe nadî ên feqîr ;
Çiqas bikin qîre-qîr
Xwedê mal û hem dirav
Didî mirovên bêbav
Didî kesên şareza
Bila bimrin yên weza !
Heçî kêm û nekirkêr
Çibkî ji mal û ji zêr ?
Heçî hestê xwe vejend
Bû xwedî mal, xwedî gund
Êko rûnî ber dîwêr
Tim bibêjî: xwedîxêr !

Xwedê dengê wî nakî
Çiqas bilind ew bakî.
Tiştek heye pir mezin
Eger tu guh bidî min :
Xwedê kîye, li kûye ?
Ez dibêjim lê zûye
Xwedî olên pir derew
Ji bo ko we bixin xew
Xwedê anîne meydan
Li hember danîn *şeytan*
Mal û hiş û bîr û can
Heçî tiştên bê ziyan
Tev xistine dest xwedê
Lê derewe guh medê !
Tu zanibe ey heval !
Ne ew heye, nejî mal.
Mal xebata destê te
Wek jendina hestê te
Vênakevî, nejenî
Tu neçênî, naçinî.
Ê kar nekî birçî ye
Ava nekî bê cî ye.
Kar û ziyan jî he ne,
Ew jî ji destên me ne
Tu baş bikî, baş dibî
Nebaş bikî şaş dibî

Bibî şivan û gavan
Fileh bî yan misilman ;
Dê tim bimênî li jêr
Nabî xwedî mal û zêr
Lê tu eger xwenda bî
Di partî û benda bî
Rojek dibî berxwedar
Dixî destê xwe hevsar
Di wê çaxê ey heval !
Hemî dibin xwedî mal.
Ne şeytan û ne xwedê
Ga, najone sersedê.
Ew miletê tim hejar
Kor û bawî, berdîwar
Kes rê şanî we nadî
We jî navê azadî
Serbest nabin li dinê
Ko zor nedin xwendinê.
Ev bûye sed salên we
Kûçik dixun malên we
Keşe û şêx û mela
Li we dikin teşqela
Axa û mîr û paşa
Wek hirç û gornepaşa
Ew tev beg û efendî
Lê win ji wan re gundî

Kar ê we ye, kara wa
Biwan xweşe ev awa
        Bere win berdîwar bin
        Dako li we siwar bin.
Win tim wesan bibin kor
Tim li jêr û ew li jor
        Jinên we bibin qewraş
        Win ji wan re herin aş
Ew dewlemend, win *feqîr*
Ew malmezin, win *heqîr*
        Li gund bimênin bê nan
        Wan rêbikin parleman
Dîsa ew dibin wezîr
Hemî xwenda, hemî jîr
        Ji wan re dibne pêwan
        Li ber derî dergevan
Lê şihada xwe bilind
Tu bistênî naçî gund
        Tijî dibî efendî
        Ne wek kurdên nexwendî.
Mal, xwendin û zanîne
Ne li jor û banî ne
        Xwedê jî maye deyndar
        Di dest mane ben û dar.
Ket, lê tu wî radikî
Mala wî ava dikî

Ji bo bikin teşqela
Pir xwe lê dikin bela.
Mal, ketiye dest mirov
Ne mirovên wek we hov
Berê hebûn rez û pez
Weke hev bûn ew û ez
Niha tev bûye Dolar
Ne wek berê tev gemar
Karên mezin pê dikin
Tenê îro hevrikin
Destûr bibî Markisî ;
Kara te nadî kesî !
Eger tu rast dixwazî
Guh bidêre, birazî :
I- Divê rist Markisî bî
Nanê we bê tisî bî
2- Divê gerden azad bî
Da ko timî dilşad bî
3- Divê hemî karker bin
Tev cotar û recber bin
Tev bi hev re kar bikin
Kara xwe tev par bikin
4- Dar di destê me kevî
Da parvebin tev zevî.
5- Heçî êl û olperest
Ne dar, ne kar, nedin dest

6- Xwendin bikevî welêt
Bêne kuştin heçî şêt
7- Mirov tev dost û yar bin
Neyarê koledar bin
8- Zorê bidin ser dezgeh
Hawîr xweş kin cî û geh
9- Her tişt bibin ên milet
Mal û xebat û dewlet.
I0-Em tev bibin xwedî rist
Jin jî bimênî serbest.
Divê ji bo van xebat
Şiyar bikin Rojhilat.
Welat kete dest neyar
Nayê dest me bi hawar
Divê xwîn bê rijandin
Milet pê bê pijandin
Bibin dostê Rojhilat
Wê bê roja me-felat
Kes bê dewletek mezin
Li ser qadê nabezin
Tenê roja rojava
Niha çûye ber ava
Kengî li wan bibî şev ;
Bi dest wa nakevî rev
Lewra hawîr dibezin
Divên ko me bidizin

Pera didin heçî pîs
Bi wan boyax dikin rîs
Heta diçin nêçîrê
Rovî dixun şinîrê
Eger milet bê, erê,
Genim nabin bênderê
Çibkim, ne baş giha ye
Hêjî li pey axa ye.
Hin jî li ser sedê ne
Hê guhdarên xwedê ne
Dikin hawar û aman
Belkî xwedê bidî wan !?
Îro sedê bîsta ye
Ê şiyare hosta ye
Heta kengî şiyar bin,
Ji dil li min guhdar bin ?
Kûre germ nabî bi tira
Dijmin namrî bi nifira
Guh mede şêx û keşe
Bi pey min de bi meşe !
Rast bibêjim, dibim dîn
Rast nebîjim, Cigerxwîn.

## ZENGİL DİNALÎ

Zengil ji dil dinalî:
Kerwan birêket û çû
        Meyger werîn ji minra
        Cama şerabê zû zû !
Pîrê mexan dibêjî :
Çiman wilo diçî, tê ?
        Min gotê: kî dizanî
        Ji kû têm û diçim kû ?
Korim, me dest bi destê
Yekî kor û nezane

Rê tarî û çirave
Rewşa cihane yek sû
Dema ku dû dibênim
Agir tê ber hişê min
Agir çiye ji kû tê ?
Nadî zanîn bi min dû.
Jîna me bê ser û bin
Dawî çîye,çi zanim ?
Wekî hêk û mirîşkin
Bê bersivin ez û tû.
Cana were bi hev ra
Serxweş bibin şev û ro
Mebêje: şerme seyda !
Porê serî sipî bû ?
Serkanîya hebûnê
Li kûye ? kî dizanî ?
Çîrok dûr û dirêje
Serî li kû , binî kû ?
Bi çewtî em bilîzin
Pir xweştire ji qanûn
Li kolanan herin, bên
Çibkim bi saz û berbû ?
Wer da meyê binoşin
Li ber defê herin, bên
Em serxweşin nizanin
Qanûn û rist û tûtû ?

## BI HÊSTIRA DİLÊ DIJMIN NERM NABÎ

Di ser hewran ve xweş em diherin
Li ber derên me parsek digerin
        Me lêkirin ev eywanên mezin
        Xwedî kirin ev çêlek û bizin
lê em dibênin koxik û reşmal
Dijîn di wan de parsek û evdal
        Me çêkirin ev nexweşxan mezin
        Li ber derên wan reben dibezin
Xercê rê nîne,ji gund bên bajêr
Bi tîfo dimrin hemî jin û mêr
        Peyda bûn li me zanîn û fêrbûn
        Ketin destê me hatin û hebûn

Hawîr digerin ji bo nanezik
Di dilde şîn tên ev gir û ev rik
Ev sitêra xweş têde em dijîn
Serbeste maldar,hov û har û dîn.
Ev rista faşîst çewt û nadirist
Şêrîn û tehlî hemî li dar xist
Kirin kerafî,xwarin û xweşî
Ev jîn û evîn kirin dilreşî
Qasek nikarin dilxweş em razin
Sal hemî diçî bi derd û gazin
Diser me ra ev xanên pozbilind
Li ber derên wan dinalin wek kund
Bere tev bimrin karker û cotkar
Tenê qasa wî tijî bî, maldar
Diber pirê ve dema diçim ez
Otomobîla me diçî pir bi lez
Li çar alî ne: parsek, ketî, kor
Destê wan bilind, berê wan li jor
Hemî birane tev ademîzad
Çima parsek bin, ev reben, bêdad
Çi karin bikin firyad û qêrîn
Dilê xwînxwara nerm nabî bi dîn
Bikêr me nayên, ne qîr, ne hawar
Şanî maldaran bidin serê dar !
Darê Mûsa ye ev kar û xebat
Dîwana Mûsa ji bo we Tewrat

## HO KARKER, BİBİN YEK

Ji welatê Amûdê
Ez hatıbûm Bêrûdê
        Mala me raser avê
        Dereng didayê tavê
Avanî yek lê dibû
Qesrek mezin çêdibû
        Karker têde ne pir bûn
        Lê tev wek bav û kur bûn
Bi dilxweşî kar dibû
Yek dihat û yek diçû
        Bilind dibûn ew dîwar
        Bi wan xweş bû gelek kar

Saat heft û heta heft
Tevan dikir kefte-left
        Xelas kirin ew xanî
        Heftqatî bû avanî
Wan karkerên dest zivir
Geh ji vir û geh ji wir
        Karê xwe wan bir serî
        Ta gihane ber derî
Derence û esansor
Danîn ko xelk herin jor
        Bi kareva, xaz û av
        Wilonakin dê û bav
Nizanim çend perçe bûn
Zanim gelek tê hebûn
        Ev xanî yê wek sera
        Ava kirin bi pera
Ew xebat û ew gemar
Ji xwedî re bûye kar
        Piştî ko dan bi dir-hav
        Nema karker çûne nav
Hey, ev rista borcewaz !
Te em kirin belengaz.
        Qesra çêkim, bê cî bim,
        Pera bênim, birçî bim.
Lê karkerên pir nezan
Wan xwe dane dest dizan

Eger ew dest bidin dar
Êrîş bikin li ser mar
Diperçiqî serê wî
Bikêr nayên perê wî
Karker ko dest hilênin
Ev xan ji war dimênin
Mal û xwendin û welat
Belkî hemî Rojhilat
Ji milet re dimênîn
Wê kara xwe bibênin
Lê wê kengî şiyar bin ?
Bi vî rengî li kar bin.
Ancex tarix bizanî
Wê kengî ev nezanî
Ji nav kurdên me rabin
Bi hev re wek bira bin
Welat têxin destên xwe
Ew saz bikin ristên xwe
Ey karkerên cihan tev !
Sivik destan bidin hev
Bikin şerê koledar
Heçî ko malê me xwar
Dijmin derxin ji welêt
Lê bibarin ar û pêt
Bighê kurdan, Kurdistan
Nekin weke Pakistan.

Ne kurd têde serbest bin
Neko kêm û bindest bin
        Ji bo bibî yek welat
        Daxwaz eve ji felat
Markis rê kirye şose
Mebin kose, ber kose !
        Ev karkerên dest gemar
        Bixin destên xwe ew dar !
Lê karkerên cihan tev
Destên xwe ew bidin hev
        Bibin ji bo me ew pişt
        Cihan dibî wek bihişt
Ev ne xewne ne *xeyal*
Ez dibêjim, ey heval :
        Rû biken û zikî têr
        Ev gemar tev dibî zêr.
Kes namênî dilbirîn
Ejî nabim Cigerxwîn.

## İLHAM

Nebî me, lê nebî bawer
Bikî ko ez semawî me
Hezaran wek me rabûne
Dizanim ko ne dawî me.
Xwedestim ez
xweristêm ez
Li ber avan
Nivistim ez.

Ne dîn û serxweş û gêjim
Ne ser mest û ne bawî me
Li ser şaxan
Dimênim ez
Li nav baxan
Dixwênim ez
Ku her tiştî
Dibênim ez
Ne rêwî me
Ne rawî me.
Ji mûsa re xwebernadim
Ji îsa re xebernadim
Ji Taha re xebernadim
Ne Zardeştî
Û Manî me.
Ne derwêşim
Ne dengbêjim
Mebîn ko serxweş û gêjim
Di ristê de şekerrêjim
Ji rengê te semawî me
Cigerxwînim ji van derda
Li meydanê xwe zû berda
Dinav bahoz û bager da
Bi bîr û bawer û dozim
Ne Şewqî û Zehawî me.

## ŞEFEQ HİLDA

Heval meyzê ! cihan îro ;
Du bend û perçe û doze
    Li alîkî şefeq hilbû,
    Li alîkî reş û toza
Şehîn-Şahê serî taca
Zerîn û gewherên lala
    Bi kurk û etlesê sore
    Siwarê çîlekî boze
Li hawîr leşker û tîp û
Siwar û tox û alane
    Ji alî Rojhilat derket
    Cihê lê deynî pîroze
Şikestî leşkerê tarî
Zer û sor têne meydanê
    Li hawîr tîp û tîrêjin
    Ji her derdare Nûroze

Çiya bûn kumbedên zêrîn
Li bejnê kixmeyê feyrûz
        Hemî candar bi hêvî ne
        Ne serma û ne bahoze
Biharê xaliça-rengîn
Bi ser qadê de berda ye
        Gul û sinbil serî hildan
        Nefel bel bû, geya koze
Tilûran qid-qid û qiştin
Bilûra dawer û xo ye
        Çem û cobar dilorênin
        Li jorê keskesor qoze
Bi govend û sema tên û
Diçin, tev tirhik û katik
        Li tenbûrê dixî bayê
        Biharê, jar û dilsoze
Li ber min pal vedaye ser
Biharê dilbera nazik
        Perireng û gulîşeng û
        Şirînlêv û şekersoze
Meger seyda bi tîr û
Awirên yarê birîndare
        Belê, pir payedarim ez
        Ku tîravêje, Amoze.

## EV DİNYA PİR XWEŞE

Pir xweşe pir xweşe
Ev dinya pir xweşe
Yar pal daye ser min
Rû wek gula geşe

Dev likenin sorgul
Ser dihejin sunbil
Xurxur ji avê tê
Hilm û sirra bê tê

Pir xweşe, pir xweşe
Ev dinya pir xweşe
Yar pal daye ser min
Rû wek gula geşe

Destê yar bi destim
Ez serxweş û mestim
Kûpik dev û lêvin
Mêze herdû sêvin

Pala xwe da ser min
Bê fehêt û şermin
Gelek xweşe ev jîn
Em bûne wek Mem û Zîn

Pir xweşe, pir xweşe
Ev dinya pir xweşe
Yar pal daye ser min
Rû wek gula geşe

Em zava û bûkin
Pêwan li me çûkin
Pal dane ser şînî
Kesek me nabînî

Hawîr me Zennarin
Perde pel û darin
Guldestê evînê
Daxwaza vê jînê

Pir xweşe, pir xweşe
Ev dinya pir xweşe
Yar pal daye ser min
Rû wek gula geşe.

Lêv ji gulên sorin
Maçan pev digorin
Lêvên hev dimijin
Tîna dil dikujin

Dema em dighên hev
Ronî didî ev şev
Xec û Siyamedin
Pir ciwan û rindin

Pir xweşe, pir xweşe
Ev dinya pir xweşe
Yar pal daye ser min
Rû wek gula geşe

Serbest û azadin
Em dilxweş û şadin
Bê gilî û gazin
Bi dil hev dixwazin

Guldestên evînê
Pêlên derya jînê
Em gihan serbestî
Sed tif li bindestî

Pir xweşe, pir xweşe
Ev dinya pir xweşe
Yar pal daye ser min
Rû wek gula geşe

Em saza hebûnê
Doza peydebûnê
Dengê saza rindî
Rewşa serbilindî

Herkes dost û yarin
Çira gunehkarin
Tev dilbij û jîrin
Xwedî hiş û bîrin

Pir xweşe, pir xweşe
Ev dinya pir xweşe
Yar pal daye ser min
Rû wek gula geşe

Ne bes Cigerxwînim
Hemî Cigerxwînin
Ne bes dil birînim
Hemî dilbirînin

## DİYARÎYA YARÊ

Ji dostê re çi rêkim, ez diyarî ?
Diyare yar dixwazî min bi yarî

Dixwazim can û dil jêre bişênim
Tenê şerme, hemî derd û hejarî

Dixwazim herdû çavan jêre rêkim
Bikêr nayên, ji wan her xwîn dibarî

Divêm jêre ziman û dev bişênim
Ne hêjane şev û rojan bi zarî

Nizanim ez, çi hêjaye ku rêkim ?
Cihan pêkve bihayê biskê tarî

Serî, naçare min danî li ber pê
Me go: şahim, tu pêlêke siwarî

Tenê xanim, bi nazî hete ser min
Zivistane, li min şîn kir biharî

Bi wan lêvên şirîn go: rabe seyda !
Tu serbestî ji min çibkî, dikarî

Ji rêve ez bezîme pê û destan
Bi jor ve hilkişîme ez ji xwarî

Ji bexçê paxilê çûme du sêvan
Ji bistanê riwan dêmên henarî

Ji lêvên erxewanî min du sed cam
Şeraba hingivînî nû, vexwarî

Bi destê xwey sipî ez kirme hembêz
Wekî pola helandim ez bi sarî

Me herdû dest li bejnê bûn *hemaîl*
Bi ber pêlan ketin reşbisk û çarî

Me talan kir ber û bistan bicarek
Kenî û go: bese rabe Hesarî !

Me go: gorî Cigerxwîn bû divê rê
Bi dest nayê wekî îro tu carî

## DESTÊ XWE PAQİJKE Jİ XWÎNÊ

Soz dabû bi min ra
Şeh û seydayê evînê :
Ko ew ji me ra wê
Sibehê bête civînê
Ey şah û perîzade û
Pir şeng û şepalê !
Carek were zû xweşke
Li dil dax û birînê

Bêzar û perîşane ji
Reşçavê te seyda
        Maçek ji du lêvên
        Teye dermanê birînê
Şebnem li gulê bexçeyê
Jîna te dibarî
        Biskên te ji miskê
        Leb û gerden ji qenînê
Dêmên te henar û
Çen û mem sêv û tirincin
        Awir ji kevanê
        Biriwan ketne kemînê
Dil xwest ko ji lêvê
Şekerî şerbetê firkî
        Min dî ku ji banî ve
        Du şêr daberizînê
Şêran veçirandin dil
Û malik biwe wêran
        Îdî me çi hêvî heye
        Vê saxî û jînê ?
Bo çi tu wesan dûr
Direvî, ey pet û latim !
        Mûyek ji te nadim
        Bi hezar zîn û şirînê

Ey xunceleba min !
Xweş û şêrînî liba min
Herkes te dixwazî
Lê biçavê nekirînê
Min daniye vê rê
Ser û malê xwe bicarek
Kesrayî li dil ta-
Ku biçim zêrezemînê.

Destên te bi xencer
Tu dixwazî bikujî min
Sed hêvî dikim destê
Xwe paqijkî ji xwînê !
Sed ah û girînê me
Qe nerm nakî dilê yar
Ma kuştîyê çavên te
Çi hacet bigirînê ?
Seyda dikujî da ku bijî
Ser bi reş û şîn.
Lê piştî ku seyda
Bikujî, qet meke şînê !
Wer da ku bi aştî
Dev û lêvên te bibosim !
Çil sale Cigerxwîne
Ji vê hevrik û kînê.

## BAXÊ ŞEHBALÊ PERÎ

Nazika min hate xwarê
        Daye hindur şawq û tav
Xanî dagirtî ji bînê
        Nêrgiz û misk û gulav
Bû bihişt û mêrg û gulşen
        Çîçek û gul pişkivîn
Baxê Şehbalê perî bû
        Padîşahim ez di nav
Dame destê gewr û nazik
        Ko bi germî min givaşt
Herdû çavan tîr reşandin
        Sorelêvan kir selav
Min di ber sînga xwe da
        Anî serî berdaye ser
Ez bi çavan lê dinêrim
        Bejn û bala pir zirav
Sihrebazin herdû çavên-
        Reşbelek, awir vedan
Rû wekî berfa zinaran
        Bisk li hawîr bûne dav
Lê çen û lêv û kepû
        Elmas û lal û gewherin

Sêv di sîngê de bilindin
        Nû gihane gewr û xav
Ketme gomanên dikûr
        Pê-lan li min dan bûn lehî
Xweş di ber pêlan diçim
        Lê kî dizanî, av û av
Min ji lêvan şerbeta-
        Sêvan vexwarî dev bi dev
Zulf û biskên misk û tarî
        Lê şikestî herdû çav
Hewrê gomanan belav bû
        Tirs û sawîr qet neman
Yar bi çavên reşbelek
        Ez zû gihandim ber delav
Ez giham ber av û deştê
        Ketme nêv baxê bihişt
Ox, li canê min çi xweş tê
        Dê çikim zêr û dirav ?
Bexçeyê mîrê cina ye
        Dilbitirs ez pêde çûm
Wê, li min dergeh vekir
        Ma wê çi bêjin dê û bav ?
Go: Cigerxwîn, bo çi mestî
        Dilbitirs û şerpeze ?
Ma gelo, wê bêne destê
        Me hero ev pêl û gav

## ÇEP Û RAST

Meygeran mey digerandin çep û rast
Meyxweran mey difirandin çep û rast

Surperî tên û diçin, gezme û tîr
Ji kevanan dirijandin çep û rast

Hay û hoyê serxweşan, dengê defê
Xew ji çavan direvandin çep û rast

Serxweşan dest dibirin naz û keçan
Me tenê mil dihejandin çep û rast

Têne govend û sema naz û lewend
Bi giranî dikişandin çep û rast

Zo bi zo hev dibirin, şeker û mey
Lêv ji lêvan dimijandin çep û rast

Şêgulî, bisk û kezî marên direş
Ser biser minde xelandin çep û rast

Rûperî awir ji hawîr vedidan
Tîr di dilda difirandin çep û rast

Gezmeyên çavên direş cerg û hinav
Li me kalan dihelandin çep û rast

Bisk-bitêla, kofîkêla li me xweş
Qozîyên çavan şikandin çep û rast

Wekû nayê di semayê keç û xort
Bi milan hev dikilandin çep û rast

Dilber û neyşeker û ebrû kevan
Zulf û cênîk diçivandin çep û rast

Tên ji hawîr dengê saz û naz û ken
Em li masê dicivandin çep û rast

Surmepoşan dil revandin, serxweşan
Xaçperestan dest pelandin çep û rast

Lalelêvan em kişandin dest bi dest
Min li sêvan dest pelandin çep û rast

## PÎR BÛM DÎL PÎR NABÎ

Ey dilberê !
Peyxamberê
Lêv şekerê
Ka soz û peymana berê ?

Biskan veke
Zulfan şeke
Dil pîr meke
Mej'bîr meke
Carek ji pişt pêrdê derê

Dêmên diges
Çavên direş
Xalên hebeş
Birhên biweş
Hilde ko her, roj bê derê

Perdê ji ser
Xalên diqer
Hilde ku her
Roj bête der
Her kes bizanin vê sirê

Şêrîn kenê
Hingiv çenê
Dosta minê
Dil hasinê
Dil girtîyê te ez tenê

Gul wek devê
Lêv hingîvê
Min tim divê,
Roj û şevê :
Ez bêm cîvanê dêm dirê

Sîh sal temam
Ez bende mam
Hûnan meqam
Lê yek selam
Carek li ber çavan nedam

Ez bendeme
Perkende me
Şermende me
Perwane me
Sotim bi pêta agirê

## BÎ TORE BÎXWÎN VÊ NAMÊ

Were bayê sipîdê xweş
        Ji dest min bigre vê namê
Bide destê sipî zendê
        Şekerxendê, bilind qamê
Bi zanîn û bi tore xweş
        Bixwîne nameyê jêre
Dibî navê me bête ser
        Zimanê şahe Behramê
Bibêje: girtiyê biskê
        Te tim jar û birîndare
Riha û bendeware ew,
        Qelabende di nêv Şamê
Dixwazî pirsekê lêkî
        Ji wî re bersivê rêkî

Ji wan lêv û devê şêrîn
Bişênî jêre peyxamê
Li jîn û rewş û pergalê
Bipirsî carekê salê
Bibêje ko şev û rojan
Ji te distênî îlhamê
Di zindanê de rûniştî
Dikî gaz û gilî her dem
Ku dinvîsî bi xwîna dil
Li herdîwar û hindamê
Eger bêjî: çiye daxwaz ?
Kesê jar û birîndare
Bibêje ko divê carek
Ji van destan vexwî camê
Li ser avan, li nav baxan
Vexun mey, guh bidin zaxan
Diriste çengek ji axa ber
Derê dilber bi bosim ez
Ji derdê min re dê xweş bê
Gelek bêtir ji perşamê
Eger dilber di xewda bî
Bi nermî bigre ser dêman
Xwe berde ser dev û lêvan
Û reşbiskên wekî lamê
Ji ber min ve dev û lêvan
Û wan dêmên wekî sêvan

Tu ramûse, selavên min
        Bide wê şox û domanê
Ji wan lêvên şirîn carek
        Ji bo min pirsekê bîne
Di nêv lîza evînê de
        Du berkên min herin damê
Dibî ew Şah û Keyxesro
        Bicarek min bikî azad
Ku ser deynim li ber Laleş
        Bikim hey, hey, di hingamê
Derê meyxaneyê rûnim
        Meyê firkim bi serbestî
Li sazê guh bidêrin em
        Bikin nalîn digel xamê
Cigerxwîn şah û xunkare
        Ku carek dest bidî yare
Bi hev re herne seyranê
        Bi vê tektîk û bernamê.

## ME DİL DAYE PERTAVÊ

Bi serbestî were perda xwe bavê
Ejî wek te mirovim, por belavê !

Were pêkve biçin nêv bax û daran
Bidêrin guh li dengê ba û avê

Ji hevdî re ku çêbûne jin û mêr
Hebûnek dûrî hev bin, qet me navê

Ji ber xwîna mine lêvên te sorin
Ji xwêdana te ye şûşa gulavê

Ji tava herdû dêman dil bi pête
Ji ber sîkê nevêm ko herme tavê

Di dîdara te de hatim pişaftin
Li wê navê, wekî mirxê di davê

Ketim gola evînê kûr û bêqam
Ji te pêve kiyê bênî peravê ?

Nexoş û bawî û tawî, me pirsî
Dibêjin: ko divêtin germe-avê

Tenê zanim ku derman gewresînge
Bi wê şîn tê bihara dil, di gavê

Wekî bazêbelek wer ser perê min
Te bavêjim Gizîra nav giravê

Bere kes me nebînî, dûrîdest bin
Bere dijmin ji dexsan berxwe bavê

Te dêm dane û biskên reş ji davan
Me dil çû danikê lê kevtî davê

Li ber mala me û we bûye govend
Dibên rê bidne bûkê, bidne zavê

Xwezê roja ku bibne bûk û zava
Li ser çavê me bê tevlî pêlavê

Ji wan lêvên şirîn camek binoşim
Wekî tihnî xwe bavêjim di avê

Ji bostanê te bigrim ez du sêvan
Ku destê min herin wê pehnenavê

Bibim talanê zalê zengozêrîn
Bihişta piştî jînê qet me navê

Perî navêm, ku lêvsorek li ba min
Tenê tiştek bi dest nayê bi lavê

Were hembêz bikin em hev bi şadî
Berî dijmin me têxî bend û davê

Tu rojî dil disojî lê metirse
Cigerxwîn hişk û xurte wek benavê

## DÎ XEWNÊN ŞEVAN DE

Di nêv xewnên şevan dilber dibênim
Li dêman ayeta rindî dixwênim

Ji tovê miskê biskê, dane da min
Ji bo ko ez di nêv dil da biçênim

Ku şîn bê lê binêrim,  bîn bikim ez
Ku tim biskan di bîra xo werênim

Dema rabim ji xew sermest û gêjim
Perîşan û nexweş, bêweş dimênim

Dixwazim ko bi diyarî bidme yarê
Nizanim,     bi kêre ez bişênim

Çi bêjim, pîr û kal û şermesarim
Di vê rê de divê perdê hilênim

Bere her kes bi min qerfa bikî bes
Li cem dilber tenê şêrîn bimênim

Xwedêkî qet mebêje kale seyda !
Ciwanim, dilşiyarim, ten bi tênim

Serî çendan sipî bûye, belê ez
Wekî gundek mezin ava û şênim

Cihan pêkve kul û xem bin di dil de
Bi yek maçê ezê wan jê derênim

Eger dilber ji dil destan bidî min
Ezê eywanê jêre nûvejênim

Eger şêrîn, lebê şêrîn bidî min
Wekî Xesro cihanê rahejênim

Were meyger, bide cema lebaleb
Ku toza bendewarî daweşênim

Delala min dinav destên neyara
Dixwazim wê bi zorê rakişênim

Mebên seyda Cigerxwîn bûye kale
Divê nemrim heta dilber bibênim.

# AGİR Û PÊTA EVÎNÊ

Evîn ji pêta agirî
Her dem ji ber nal û girî
Kî karî carek hilgirî
        Ahî ji destê te evîn

Evîn bicarek ar û pêt
Herçî ku pêtek pêve bêt
Bê hiş dibî şeyda û şêt
        Ahî ji destê te evîn

Şêrînê pêşî, wek şekir
Pê xweş dibin can û ciger
Dawî li min dil kir du ker
        Ahî ji destê te evîn

Bawer dikir tenha evîn
Dîdar û hembêz û civîn
Maçin ji lêvên pir şirîn
        Ahî ji destê te evîn

Heta ku ez serxweş kirim
Pir hêvî û bê hiş kirim
Sermest û pir bêweş kirim
        Ahî ji destê te evîn

Ez mest û jar û dîn kirim
Wer gawir û bêdîn kirim
Bê xwendin û bê tîn kirim
        Ahî ji destê te evîn

Evîne rewşa dilberê
Şêrînkenê, lêvşekerê
Agir di nêva cigerê
        Ahî ji destê te evîn

Ê dil di tora dilbera
Can daye çavên esmera
Armancê tîr û awira
        Ahî ji destê te evîn

Ebrûkevana porşevî
Kî dil di benda wê kevî,
Kengî dikarit rakevî ?
        Ahî ji destê te evîn

Wê nazika şeker ji ken
Da min ji rêve lêv û çen
Suhtin li min wê can û ten
        Ahî ji destê te evîn

Evîn ji pêta agirî
Dil girtiye qet namirî
Fêde çine ah û girî
        Ahî ji destê te evîn

Nalîn ji ber daxên dikul
Jan daye cerg û nav û dil
Lê, min şikestin pişt û mil
        Ahî ji destê te evîn

Gava ji dilber dûr dibin
Birîn di dil de kûr dibin
Sermest û pir rencûr dibin
        Ahî ji destê te evîn

Pir ah û pir awaz didim
Perwaz bi rengê baz didim
Diser çiyan re bazdidim
        Ahî ji destê te evîn

Ger çi ku min bazare dil
Pêt û birûsk û are dil
Paytext û warê yare dil
        Ahî ji destê te evîn

Radare dil, dûrbîne ew
Yar têde kesk û şîne ew
Tehlî li pey şêrîne ew
Ahî ji destê te evîn

Dilber ku carek bête bal
Datênî ber pê zêr û mal
Ji bîr diçin dost û heval
Ahî ji destê te evîn

Ahî ji dest şêrîn devê
Şeker kenê, lêv hingivê
Jehr û mirin bî, min divê
Ahî ji destê te evîn

Jehra ji wan lêvên şirîn
Xweş tê li min wek *pensilîn*
Pê xweş dibin derd û birîn
Ahî ji destê te evîn

Cama evînê pir bi weş
Çawa vexwar ez çûm ji hiş
Ger ez mirim canê te xweş
Ahî ji destê te evîn

Evîn ji destê yarî bit
Çendan ku pir dijwarî bit
Dê dil bi wê hişyarî bit
        Ahî ji destê te evîn

Evîn wekî saza dile
Nalîn û awaza dile
Xweş vîn û daxwaza dile
        Ahî ji destê te evîn

Evîn ji çavên reş dizê
Bîna binefş û nêrgizê
Wek şîreya şêrîn mizê
        Ahî ji destê te evîn

Carek ji destê dilberê
Şêrîn lebê, dêm gewherê
Dîsa vexum ez wek berê
        Ahî ji destê te evîn

Ew nazika pir gewr û rind
Dêm gewhera, bala bilind
Carek bidî min ew lewend
        Ahî ji destê te evîn

Ez dê vexum pingavî bî
Jehr û mirin pir navî bî
Wer min mirin wê gavî bî
        Ahî ji destê te evîn

Em dê vexwîn, wer dîn bibin
Pir serxweş û bê dîn bibin
Can û ciger tev xwîn bibin
        Ahî ji destê te evîn.

## Dİ SER ÇAVÊN ME RA HATÎ

Tu hatî lêvşirîna min !
Evîn û dilvirîna min !
Were xweşke birîna min !
        Di ser çavên mera hatî !

Bi xeml û xêz tu wek *Zînî*
Şepal û şeng û şêrînî
Ji daxwazê re dûrbînî
        Bi dîdarê pet û latî !

Bi dîdara xwe pir rindî
Birû heyv û şeker xendî
Di vê rê de hinermendî
        Bi bejna xwe tu şemşatî

Ji min can û ciger kuştin
Dil û mêlak hemî miştin
Tijî tîr û ber û xiştin
        Bese ev malemîratî !

Bese ey dilber û gawir !
Bibarîne li min awir !
Te can û dil kirin agir,
        Bi talan û bi berbatî

Te maçek da bi şîranî
Me can û dil li ser danî
Û gawir hêj dibê: kanî ?
        Te qatek da bi sed qatî

Bese seyda, çine gazin ?
Di dil de tîr û rim bazin
Me xew nayê, çilo razin ?
        Di vê cengê de Şehmatî !

Bi bejna xwe neya avî
Ji bircê derkevî tavî
Di her çax û di her gavî
        Tu naz û tirhik û katî

Bi nazdarî tu wek şengî
Sipî zendî, şeweq rengî
Çi padîşah û serhengî ?
        Dikî zorê li min tatî

Li ber te tat û cotarim
Meger ez jar û bêzarim
Li bejna te evîndarim
        Li te pîroze paşatî

Li te pîroze ey dilber !
Ku mal û can û dil yek ser
Me dan ber pê, evînperwer
        Ezim rendê xerabatî

Xerabatim d'meyxanê
Me mey da Ehmedê Xanê
Cezîrî firke fincanê
        Ji kûp û kûzikên *batî*

Ji kûpê destê kolxozê
Perîrengê, şeker sozê
Me mey noşî giham dozê
        Du sêvên sore *exlatî*

Vexwarî min ji wan lêva
Şerab û şerbeta sêva
Gelo kes dî ji min pêva
        Giha bejna lihevhatî

Hezar û sed evîndarin
Di vê rê de birîndarin
Bi qêrîn û bi hawarin
        Tenê ez xurt û jêhatî

Di vê rê de gelek mêrim
Piling û ejder û şêrim
Bi tac û gewher û zêrim
        Bese seyda ebûqatî !

Cigerxwîn bes bike forta
Tu pîrî lê wekî xorta
Te dil da ber şiv û rota
        Bixwe kohê Eraratî.

## HELBESTAK

Ebrû şevê
Şêrîn devê
Lêv hingivê
Xanim !

Ez nexweşim
Ne serxweşim
Derî veke
Canim !

Me soz dabû
Bighêne hev
Herdû bi şev
Şerîn !

Evîndarê
Çavên belek
Wan diranên
Zêrîn.

Ebrû şevê
Şêrîn devê
Lêv hingivê
Xanim !

Ne serxweşim
Ez nexweşim
Derî veke
Canim !

Em bi hev re
Çûbûn çiyê
Efendîyê
îro.

Reqs û sema
Li ber çema
Mane heta
Nîro.

Ebrû şevê
Şêrîn devê
Lêv hingivê
Xanim !

Ne serxweşim
Ez nexweşim
Derî veke
Canim !

Te go: were
   Ez bi te ra
      Heta sibê
         Razin.

Tu deymeke
   Derî veke
      Ji bo çi ev
         Gazin ?

Ebrû şevê
   Lêv hingivê
      Şêrîn devê
         Xanim !

Ne serxweşim
   Ez nexweşim
      Derî veke
         Canim !

Ez şewitîm
   Dil peritîm
      Wer şemitîm
         Hatim.

Rob li xwe ke
Derî veke
Tu deymeke
Satim.

Ebrû şevê
Lêv hingivê
Şêrîn devê
Xanim !

Ne serxweşim
Ez nexweşim
Derî veke
Canim !

Bi wî serî
Ji ber derî
Maçek nedî
Narim.

Ji awirên
Çavên belek
Zanî birîn
Darim ?

Ebrû şevê
Şêrîn devê
Lêv hingivê
Xanim !

Ji bo xwedê
Tu guh medê
Îşev şeva
Înê.

Xwe dîn meke
Derî veke
Ez hatime
Dînê !

Ebrû şevê
Şêrîn devê
Lêv hingivê
Xanim !

Ne serxweşim
Ez nexweşim
Derî veke
Canim !

Sebra dilê
Rû ji gulê
Dipaxilê
Sêvin.

Mala minê
Ji hatinê
Daxwaz :
Dev û lêvin.

Ebrû şevê
Şêrîn devê
Lêv hingivê
Xanim !

Ne serxweşim
Ez nexweşim
Derî veke
Canim !

Cejne siba
Bi maçekê
Pîroz bike
Jînim.

Dilbirînê
    Çavên belek
        Ji ber te bê
            Tînim.

Ebrû şevê
    Şêrîn devê
        Lêv hingivê
            Xanim !

Ne serxweşim
    Ez nexweşim
        Derî veke
            Canim !

## CEJNE YAR DİLXWEŞ DİBÎ

Cejne îro kixme poşî
Yar gelek dilxweş dibî
        Xunceleb rû wek gula
        Nû pişkivî pir geş dibî
Her çiqas gewr û sipî bin
Gerden û dêm û enî
        Temberî rengê şeva
        Tarî bi ser de reş dibî
Awirek çavên belek
Wek tîr li cergê kê kevit
        Dilşikestî bendewarê
        Ebriwên mehweş dibî
Ê ku çil salî şevên reş
Postnişînê kunce bit

Lê bi fermanek şirînê
Ser bi ber Laleş dibî
Devbiken ber dî bi pîrê
Payedar û olperest
Rast û çep dê bê sema
Wek lewleb û kerkeş dibî
Ev cihan pertew didit
Ger dêm ji perdê derkevin
Goşeyên çavên direş
Bişkin, tijî ateş dibî
Ger sipîdê bête der
Wek şêr ji lanê derkevit
Erdeşêr bî, ey Cigerxwîn !
Her li ber bê weş dibî

## GAZİN ÇİNE

Gazina meke bi kêr nayên ev gazin
Çima tu nayê di ber hev de em razin ?

Em herdû ji hevin û hev dixwazin
Ger çi dijminê hov, dirinde naxwazin

Te maçek berî pêlakê dabû min hê ...
Ev çend salin ko em ji ber wê ranazin

Ca, were kulmekê li min de cana !
Da bê guhê min dengê bazin û berbazin

Li sazbendê evinê guh bidêre,
Li hawîr jîndar bi qêrîn û awazin

Nazan ber bi jêr ve direvin bê doz
Lê evindarin serbilind û efrazin

Ji hebûna me ye ev deng bi jînê ket
Em jê ra sazbend û em jê ra devsazin

Ev dar û ber û çiya û av û baran
Ji jînê ra tev kêlik û tev razin

Ev çavreş, ev dêmgeş, gewr û naz û rind
Kur hemî qeşeng û keç hemî têrnazin

## NAME YA DERD Û XEMAN

Wek rojî, ji bircê ko tu hatî kelehê
Tîrêj ji xwe berdane riwên qad û mehê

Keyxusriwê ko hatî ji eywan û sera
Ku serî daniye xweş me li ber pê te şehê

Nameya derd û xeman ko bi xwîna xwe nivîsî
Da destê te, kengî tu dipirsit gilehê !?

Rûdêm wekî rojin û kezî bûne xefalok
Birhên te ziravik, wekî nûbar û jehê

Perda xwe tu rake ku şefeqrenge xuyabin
Da ser bi tewênim, li berî qublegehê

Camek ji şeraba lebê lala bide min
Rewşa xwe dibênim, di şerab û qedehê

Carek were vir ko tu dixwazî me bibênî !?
Dilşadî bibin em herdû hetta sibehê

## YARA

Yara te bi yarî tijî kul kirye derûnim !
Şev ta bi seher, nal û girî, xwar û nixûnim.
Haşa ko hebin wek te bi dîdarî û rindî
Agahî, dizanî, di evîna te çi tûnim ?

Beyhûde me dan bê pere ev jîn û ciwanî
Zer bûme seraser, pelê payîzê xezanî
Der pêlê xem û girtîyê zindanê nezanî
Goya, li cihan ez ademîzadê hebûnim

Zencîrê setemkarî li mil hatine pêçan
Çend sale li serhev girtiyê zindan û perişan
Bindestê neyaran, kul û xem, qamçî û lêdan
Çil sale li serhev ku bi dil xerqeyê xûnim.

## PENGE RÛ

Bejn û bala pir şirîn û
Şox û şenge, penge rû
        Tenberî wek şevreşe
        Ebrû ji hîv û mange rû
Lê ji çavan tîr dibarin
Rengê marin reşgulî
        Ser bi ser sîngê de tên
        Lê li jorê şenge rû
Bisk û cênîk tang û topin
Şer digel xalan dikin
        Herdû ebrû reşkevanin
        Lê digel wan cenge rû

Gerden û sînga sipî
Rengê berfa ser çiya
Lê di meydana evînê
Pir bi nav û denge rû
Ev kezî û bisk û ebrû
Çav û lêv û bejn û bal
Tîp û tang û leşkerin
Lê tenê serhenge rû
Min di rû de roniyek
Dî, ko me ser danî li ber
Qencî û dana hebûnê
Kê diye evrenge rû ?
Xoşî û şîranî û rindî,
Ciwanî, têde pir
Payedarî, serbilindî
Ez dibênim benge rû

## TU ZANÎ MA ÇI DERMANE

Ji dîdara perî rengê
Birû heyvê gulî şengê
Enî gewrê wekî pengê
Dinalim ez wekî çengê
Bi qîr û nal û giryanim
Tu zanî ka çi dermanim ?
Li ser çavên me bê xanim !
Bi bosim ez lebên lala

Ji wan lêvan dinoşim ez
Meke bawer li hoşim ez
Birîndar û nexoşim ez
Seraser dil bi coşim ez
        Xerabatim perîşanim
        Tu zanî maçe dermanim
            Li ser çavê me bê xanim !
            Bi bosim ez lebên lala

Perîşanim di vê bendê
Ji derdê vê şeker xendê
Belek çavê sipî zendê
Disojim ez wekî findî
        Li dîdara te perwanim
        Tu zanî maçe dermanim
            Li ser çavên me bê xanim !
            Bi bosim ez lebên lala

Bi dîdara xwe ez kuştim
Şikandin tev mil û piştim
Ji wan tîran ko dil miştim
Serepa ez nexwaş hiştim
        Di qeyd û bend û zindanim
        Tu zanî ma çi dermanim ?
            Li ser çavê me bê xanim !
            Bi bosim ez lebên lala.

## DERDÊ DERÛNÎM

Mala me xerabkir te bi vê hatin û çûnê
Wer rûne li nik min berî bimrim were rûnê

Espîdê were da te bibosim li xurînî
Maçek ji du lêvên te, li şûna qeretûnê

Em hatine jînê ji bo hevdî bimijênin
Dilxoşîye sermayeê vê jîn û hebûnê

Wek sorgulî rûgeş, ku di jînê de ciwanî
Lêvên ji eqîqê ku te sor kirne ji xwînê

Bo çî tu li hember vediwestî wekî rojê ?
Gulyên zerezeytûnî lipêşber me dihûnê

Ger ez te dixwazim, ji hebûnê eve daxwaz
Sed dax ji nebûnê me kişandin li derûnê

Sotame seraser di evîna te de, dilber !
Wer guh bide dil, qîç-qîçe wek arê qelûnê

Maçek bide seyda û bicarek tu mexeyde
Sed heyfe ku dilkul herî bin ax û nebûnê

Hingî wekû saxe bere dilxoş û ciwan bî
Lê kengî serî danî bicarek meçe şûnê !

Seyda ku Cigerxwîne ji tîrê biriwên reş
Dil jare li ser sorgulê dêmên te dixûnê

## OCAXE YAR

Serbest ku ketim odeyê wê hore-surişte
Bêcamê şevê lê bû, sivik ketme tenişte

Maçek me ji lêvan bir û dest çûne du sêvan
Gazin ji mitêlê dikirin: kêlek û pişte

Ocaxe, me ser daniye ber Ebriwên tûz-reş
Parastî ji çavan bi tilisim û bi niviştê

Narinc û gul û çîçek û beybûn û binefşin
Min dest bire nav sîng û beran, ketme bihiştê

Sûnd xwar ji te pêve kesî ev der ne pelandî
Min go: ji xwe ez diçme cihên kes ne gihiştê

Nêçîr, me li: dêm û leb û çav û biriwan kir
Go: ma ne bese, ka ji çiyê dakeve deştê ?

Min go: ser û pa tev pet û lat û senemî tû
Wek agirê Zardeştî di pûtxan û keniştê

Bawer me bi te anî ye, ser daniye ber pê
Kî ser nedî ber pê, ku ji eywanê bi meş tê ?

Ev bûn û nebûn, tev ji te ra jêder û dîdar
Ev xoşî û naxoşî, ji wan çavê keleş tê

Jîna te ye, vîna te ye, dîna te ye cana !
Ji dil û canê Cigerxwîn re gelek xoşî û weş tê.

## YAR HAT CİVÎNA MİN Bİ ŞEV

Yar hat civîna min bi şev
Şevnem li Nesrînan rijî
        Çîçek weşandin wê bi dev
        Sunbil ji şerma rahejî
Nêrgiz bi beybûnan kenîn
Sorgul ji lêvan pişkivîn
        Çol tev li ber pê bû bihar
        Herder ji bînê ma tijî
Doza ciwanê cane, lê
Cama lebaleb daye min
        Ma kî ji lêvên Erxewan,
        Cama şerabê namijî ?

Cama şeraba lal û dir
Min lêv bi ser lêvan de bir
        Sêsed qedeh min jê vexwar
        Tîna dilê min nakujî !
Dilxweş dibûn, rûgeş dibûn
Bê hiş dibûn, serxweş dibûn
        Bê jîn û vîn û leş dibûn
        Ê yar bi dest ket, ka mijî ?
Piştî giham ava heyat
Bi hiş xwe hatin tev lebat
        Mêtin ji dev qend û nebat
        Bihişte ev şev, her bijî !
Pişkojê vê jînê emin
Beybûnê çêbûnê emin
        Dilsojê vê çûnê emin
        Lê hêjî candar napijî
Boçî dibin perda şevê
Bighême vê şêrîn devê
        Wê jî wekî min ev divê :
        Dako bi şadî xweş bijî

## XEYAMÎ

Qurtek ji şeraba rez
Û qurtek ji şeraba dev...
Were ey hevala min !
Serxweş bibin em tev
Ji jînê me ev şev dizîye
Ba bertelef neçî pir heyfe
Bi destê me nakevin carek dî
Ev xoşî, ev şadî, ev reng şev.
Berî ko sipîde bavêjî û bangdêr
Biqîrî, bibêjî: hoho ho ho !..
Ger pêwan bi ser me de bên
Bi destê me nakevî çûn û rev

Ka şerabê vexun belkî em

Bighên veşartiyên jînê xweş

Çiman em dê bitirsin, ji kê ?

Kes kesî nasnakî, ne ew û ne ev

Em konê xwe barkin, wê kî, kî,

Li warê me deynî kî, kî ?

Çima em ji hev ditirsin,

Û çiman em dixwazin hev ?

Dîwarên Bêdawî li kuye,

Kî zanî, kî zanî, kî, kî ?

Cihan şevreşe, tev bahoz û toz

Serma û banger û bandev

Tako jîndarin were em hev

Bimijin hemî mêr û jin

Lêvên min û tene hingiv û şêrîn

De were bi şadî em bihingivin hev

# TİHNÎME

Wer, da me bibînî, şeh û rêzanê evînê
Zanî çiye daxwaz, me ji vê hatin û dînê ?

Gazinde dikin can û ciger gazî û qêrîn
Gilyê te dikin, ey sebebê nal û girînê

Xencer te li dil xistiye ey xwînxwar û mêrkuj !
Maçek ji du lêvên te ye dermanê birînê.

Hacet çiye nazî û ji sazê çi dixwazî ?
Wer guh bide carek tu li vê nal û enînê

Carek tu bixwîne şeh û rêzanê ciwanan
Nama ji te ra ko me nivîsandî bixwînê

Cana, te nevêtin bimirim zû were ser min
Lê ger te nebênim, dimirim ez ji nedînê

Tihnîme, dizanim qedehek mey ji lebên sor
Ew dil me di parêzî ji vê sohtin û tînê

Mizgîn ji mera hat, ku şirîn têtе civanim
Min can û ciger daniye ber pê te şirînê

Herçî ku binasî te bi dîdarî û rindî
Guh nadî bicarek li Xec û Zîn û Şirînê

Sed Zîn û Şirîn û Xec û Dilşah û Perîşan
Xemla xwe çirandin bi girî, nalî û şînê

Destbestîyê dergahê te ne sed Mem û Ferhad
Bêzî ne ji vê dewlet û vê saxî û jînê.

## ŞÊRÎN LEBÊ

Bibêm çi, bê: libê, şêrîn leba min !
Were rûne bi şîranî li ba min

Li bejna te qebayê kesk û etles
Ku rengîn kir bi xwînê ew qeba, min

Birîndarê du çavênreş hezarin
Niha bûne hezar û yek teba min

Li hawîr em dinalin ah û qêrîn
Tu guh nadî kesî, xanim, seba min

Di rojê tar û tengî xem revînî
Di van rojan xwezî wek te heba min

Li min barîn şev û rojan kul û xem
Xuyanabin ji hev roj û şeba min

Hemî pêl û lehî, tarî û rûreş
Nizanim wê çi bênin ser, siba min

Tenê min daye ser vê rê bi xurtî
Tiwî ala û tox û *mewkiba* min.

## DİLO MİZGÎN Lİ TE ŞABE

Dilo mizgîn li te şabe
Şekerxend û bilindê hat
Bese îdî ji xew rabe
        Sipîzend û lewendê hat

Li ser çavên me xana min
Ciwan û cerg û cana min
Ji bo maçek bidana min
        Sipîdê gewr û rindê hat

Ji bo serkî bidî ser min
Ji bo carek werî ber min
Ji zindanê bixî der min
        Tilî wek mûm û findê, hat

Emîr û begler û xanê
Ji bircê hate eywanê
Go: wî derxin ji zindanê
        Ziringênî ji zendê hat

Ji zindanê birim bircê
Şirîn û nazik û gurcê
Du dur dan min ji nêv durcê
        Belexşan bûn ji Hindê hat

Belexşan sore wek dêmê
Bi rengê birçîyan têmê
Ji wan lêvên şeker zêmê
        Şeker barî, ji xendê hat

Ku şêrînken giha ba min
Selavek pir biha da min
Şirîn û rind û şaha min
        Ji bo berdî ji bendê, hat

Ji bendê ez kirim azad
Bi yek pirsê kirim dilşad
Cigerxwîn, bes bibe bêmad
        Şeha seyda pesendê, hat

## FETWE YA PÎRÊ MEXAN DA

Îşev civanê me ye
Bêjin keçê bila bê
Li nav bexçe rê heye
        Ko em vexun şerabê

Emê rûnin li banî
Mase li jor me danî
Da ko nebit xuyanî
        Şêrîn û mahî tabê !

Perdê ji ser xwe bavê
Guhdêre saz û avê
Awir da dil ji çavê
        Xwe dîn û malxerabê

Dilber ku hate ba me
Nazdar û meş xerame
Wê bi destê xwe da me
        Şîra ji nêv leba bê

Meyger meya giran da
Awir vedan û yan da
Fetwa pîrê mexan da
        Ji zirne û ribabê

Şerînkenê giha min
Wê zû devê xwe da min
Mîr û padîşeha min
        Şêrîne wek xuşabê

Cam û qedeh li hev dan
Sed maçe min ji dev dan
Sîng û memik me tev dan
        Bîn ji misk û gulabê

Ez dîn kirim bê dînê
Serxweş kirim bi dînê
Bi şîşikên evînê
        Dil kirye wek kibabê

## DİL PERÇE PERÇE HÛR DİKÎ

Kî dizanî yar çima ko xwe ji min wer dûr dikî
Yek awirên çavên belek, dil perçe perçe hûr dikî

Lê her dema tê û li min pirsê dikî dil xweş dibî
Carek ku bê û dey nekî, daxa di dil da kûr dikî

Ko devbiken tê bal me da, sorgul li hawîr şîn dibin
Lê ez dizanim wê çikî, ko ebriwan wek şûr dikî

Wê xwînxwerê talan kirim ko dane ber pê can û dil
Lê ev setem ma kî dikî, wek guhreş û Teymûr dikî

Min dil dinalî ta sibê hawar ji destê dilberê
Ca, wer temaşa, guh bidê, dil wek ney û tenbûr dikî

Lê min ji wan çavên belek, sed ah û nalîn tên ji dil
Heta ku dil pêlan didî wek Dicle û Xabûr dikî

Ma qey ji vê xwînxwariyê, carek kesî karek diye ?
Gorî, Cigerxwîn, bo çi dil pir kul û rencûr dikî ?

# HOVE NEDA RENGÊ XEZALA

Pêjna me kir û hove neda rengê xezala
Dûr ket û nerî herdu birû rengê hilala

Min go: tu çiman wer direvî qey me nenasî ?
Go: şerm û fehête me ji van dost û hevala.

Min go: de were, da bi edeb biçme tewafê !
Yek bose ji Qewsên biriwan bo me helala

Go: ma te diye, fetwa te qey qewlê qedîme ?
Min gotê: bi min qewlê qedîm xewn û xeyala

Ez muftîyê işqim, bi xwe fetwa me evîne
Go: muftîyê işqê tiwî, fetwa te betala

Min go: tiwî laleş bixwe hatim te bi bosim
Go: xirqe û bendik tunebin ev jî mehala.

Min gotê: Cigerxwîne di benda te dinalî
Go: raste Cigerxwîne, di benda me delala,

Destê xwe bi min da û me ser ber bi piyan bir
Go: na... tu Cigerxwîne minî, hilkişe bala !

# BEXTÊ SIPÎ

NIŞTIMAN

Bextê me sipî bûye
    Sipîdê ko tu hatî
        Cana pet û latî !

Wek roj vedijênî dilê seyda
    Ko te patî
        Pertav û şewatî !

Çavên me li rê te qerimîn
        Qilzemê jînê !
            Pingavê evînê !

Daxwaz me di jînê tiwî
    Wek qend û nebatî
        Ey doh û heyatî !

Pir kûrî, bi nûrî,
    Wekî pertew tu dixanî
        Ez laş û tu canî !

Ez girtîyê zindan
    Û tu wek birc û kelatî
        Daxwaz û felatî !

Keyxusriwê rinda !
        Seyda
            Wek serxweş û şeyda

Cotek tu ji sêvên
    Ber û bustanê xelatî
        Bidyê bi xelatî !

## GUH BİDE DÎROKÊ

Nexweşim li ber serê min
        Rûniştiye xweşkokê
Serê xweyê gewr û boz
        Min daniye ser çokê
Dinehwirênim, dîroka
        Jêre dibêjim ez
Bi ser min de pûnişt
        Û guh didî dîrokê
Min çavê xwe vekir
        Allah !çi binêrim ez;
Ebrû xwarin wek hîv
        Û dêm sipîne wek rokê
Min destên xwe ber bi
        Xwedê ve bilind kir û go :
Xwedêwo ! biparêze vê
        Ji çavan, zarokê
Ez lê dinêrim û dihejim
        Wek neya nav avê
Ronikên xwînî riwê min
        Kûr kirine we cokê
Çi xwêdanek bi min ket
        Lê nizanim çi bêjim ez ?

Herwekû havîne û ez
Ketime serşokê
Xwe bi ser min de xwar kir
Û lêv gihane ser lêv
Çi bihneke xweş jê tê
Wek gulav û bînokê
Min destên xwe avêtin bejnê
Û bir û anî xweş
Hîç gazinde nekir ji
Maç û gezan, keçkokê
Min ew bi ser hevde givaşt
Û talanê dêw bir
Carek ne xeydî da nebêj-
îmê xeydokê-xeydokê !
Maç û gez û guvaştin û
Gevzandin û talan
Bû rezê ko bikevî
Ber terez û teyrokê
Divê mizgevtokê ji Merdox
Re ava bikim ez
Ko xiste nav destên min
Devliken û nermokê
Cigerxwîn ! çîroka wek
Şekir dibêjî, raste
Yan ketiye nav sawîr
Û goman û çîrokê

## EMAN HEY LÊ

Tu şêrînî pir ciwanî
Lêv ji sorê erxewanî
Kê bi vî rengî tu anî ?
Wer di nav destê min danî
          Hey lê hey lê
          Hey lê hey lê...
                    Şev û rojan
                    Ez di meylê

Xamekêşan xweş nivîsî
Heyv û rojin lê diîsî
Qelen pire hezar kîsî
Kes nikarî te ramîsî
          Hey lê hey lê
          Hey lê hey lê...
                    Şev û rojan
                    Ez di meylê

Zirav bejnê nûzarokê
Kiras kinê li ser çokê
Por şevînê, rû ji rokê
Hey lê hey lê
Hey lê hey lê...
Şev û rojan
Ez di meylê

Min xwedî kir bi xêzanî
Bi dilhişkî, cangiranî
Mal û canê xwel ser danî
Hey lê hey lê
Hey lê hey lê...
Şev û rojan
Ez di meylê

Bilind bejnê serwa sehê
Enî rojê ebrû mehê
Neghane vê remza te hê
Hey lê hey lê
Hey lê hey lê...
Şev û rojan
Ez di meylê

Gewher çenê şêrîn kenê
Hingiv di nêv lêv û çenê
Berfa sipî di gerdenê
Naghê kesî bi xwestinê
Hey lê hey lê
Hey lê hey lê...
Şev û rojan
Ez di meylê

Reştemberî rengê şevê
Ebrû kevan ciwan çivê
Xwîn şêrînê wek hingivê
Rengê gulê lêv û devê
Hey lê hey lê
Hey lê hey lê...
Şev û rojan
Ez di meylê

Çavên belek çi mêrkujin
Lêvên disor çi xwînmijin
Bisk û kezî çi xwînrijin
Dêm û enî pir paqijin
Hey lê hey lê
Hey lê hey lê...
Şev û rojan
Ez di meylê

Lêv şêrînê dêm şekerê
Carek me dît li ber pirê
Min bi çavan gazî kirê :
Ka ew evîna mey berê ?
Hey lê hey lê
Hey lê hey lê...
Şev û rojan
Ez di meylê

Gotin xweşê, dilovanê
Gulê gazîkir rihanê
Wer binêre vê ciwanê
Kê ev reng û rindî danê ?
Hey lê hey lê
Hey lê hey lê...
Şev û rojan
Ez di meylê

Reyhan kenî gote gulê :
Sêv gihiştin di paxilê
Bisk û kezî reşkakilê
Lêv dermanê derdê dilê
Hey lê hey lê
Hey lê hey lê...
Şev û rojan
Ez di meylê

Bi qûndera kabik teşî
Hat û di ber min ve meşî
Rista mina goşî weşî
Hûna mina *qafî* xweşî
Hey lê hey lê
Hey lê hey lê...
Şev û rojan
Ez di meylê

Rista mina ji gewhera
Ronî didî rengê çira
Bira nadî destê bira
Min rêkire ji dosta xwe ra
Hey lê hey lê
Hey lê hey lê...
Şev û rojan
Ez di meylê

Rabe ser xwe dilovanê !
Em derkevin ji zindanê
Dest bi destên te hozanê
Da em herin Kurdistanê !
Hey lê hey lê
Hey lê hey lê...
Şev û rojan
Ez di meylê

## EVÎNA DİL

Evîna dil, te dil kirye bîrîndar
Bihara min, hemî zer bûn gul û dar

Me ew rojên ciwanî, dan bi tolik
Ketim heştê, ji nûve bûm evîndar

Diran û çav û dil pêkve şikestin
Û porê min sipî bûye bi yek car

Bi her çaran dibî xort û dibî pîr
Ji bona min nema hêjane her çar

Nezanim ez, digel jînê dibazim
Weke berxê dinav pencên gurê har

Cihan pêkve di çavê min de xweş bû
Niha, pîrim, di çavê min de bû sar

Şeva reş pej vedane, hate ser min
Ku roja min liber avaye, êvar

Ciwan bûm, ez bi dost û yar û kes bûm
Ku pîr bûme, hemî kes bûne nayar

Evîna min wekî hespê çelenge
Revandim ez, ne zengo û ne hevsar

Li kû dimrim, diçim kû, ez nizanim
Dema dimrim, ezê çibkim bi Hessar ?

Ketim heştê û serjêr bûme deştê
Ne ew: lat û ne ew hîm û ne ew dar...

Berê rengê pilingan ez bi saw bûm
Ji ber xapan, niha ez bûme keftar

Bi ber pêlan ketim bê doz û daxwaz
Dinalim ez wekî Hirçê birîndar

Ciger-xwîn bes bibêje, pir dirêje
Bese kurdo, ji xew rabe tu hişyar !...

Stockholm - I8/6/980

# NİVİŞTÊN CİGERXWÎN YÊN ÇAPKİRÎ

1- Dîwana yekem (Pirîsk û pêtî)-1945
2- Cîm û gulperî(çîroka yekem)- 1948
3- Dîwana diwem (Sewra Azadî) -1954
4- Reşiwê-Darî(Çîroka diwem)- 1956
5- Gotinên Pêşîyan -1957
6- Destûra zimanê kurdî -1961
7- Ferheng(perçê yekem)-1962
8- Ferheng(perçê diwem)-1962
9- Dîwana siyem(Kîme ez ?)-1973
10-Mîdya û Salar -1973
11-Dîwana çaran(Ronak) - 1980

Welatê me Kurdistan ji alîya dewletên kolonyalîst hatiye perçe kirin û hemû hebûnên wê bi awakî nemîrovî jê tê dizîn û gelê Kurdistanê bi hovîtî tê êşandin. Ew dewletên faşîst û şovênîst dixwazin gelê kurd di nav xwede winda bikin. Ji bo wê jî, zimanê me hatîye qedexe kirin û em nikarin li welatê xwe bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin.

Lê, gelê me dijî wan zordestîyên hovîtî stuyê xwe xwar nekiriye û bi awakî xurtî berxwe dide. Dijmin çiqas zimanê me qedexe bikin jî, gelê me xwedîye zimanê xwe bûye û hozaneke mezin, wek Cigerxwîn anîye meydanê.Cigerxwîn di hemû jîndarîya xwe de,cihê xwe di şerê gelê Kurdistanê a Azadîde girtîye û dengê wî bûye dengê gelê me.

Ev Dîwana 4'a ya Cigerxwîn, ku me li Swêd çapkir, wê dengê gelê Kurdistanê di ruwê dijminde bilindtir bike.

ROJA NU

**WEŞANÊN ROJA NU**

NIŞTIMAN

Welatê me Kurdistan ji alîya dewletên kolonyalîst hatiye perçe kirin û hemû hebûnên wê bi awakî nemîrovî jê tê dizîn û gelê Kurdistanê bi hovîtî tê êşandin. Ew dewletên faşîst û şovênîst dixwazin gelê kurd di nav xwede winda bikin. Ji bo wê jî, zimanê me hatîye qedexe kirin û em nikarin li welatê xwe bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin.

Lê, gelê me dijî wan zordestîyên hovîtî stuyê xwe xwar nekiriye û bi awakî xurtî berxwe dide. Dijmin çiqas zimanê me qedexe bikin jî, gelê me xwedîye zimanê xwe bûye û hozaneke mezin, wek Cigerxwîn anîye meydanê.Cigerxwîn di hemû jîndarîya xwe de,cihê xwe di şerê gelê Kurdistanê a Azadîde girtîye û dengê wî bûye dengê gelê me.

Ev Dîwana 4'a ya Cigerxwîn, ku me li Swêd çapkir, wê dengê gelê Kurdistanê di ruwê dijminde bilindtir bike.

ROJA NU

WEŞANÊN **ROJA NU**

RONAK DÎWANA ÇARA